


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



6
1984

NAVEROK

Nameyên Xwendevanan.....	3
Çend Etabên Pêştaçûyina Zıman û	
Zaravên Kurdi.....	4
Hevpeyvînek B1 M.E.Bozarslan Va.....	6
Kongra Kurdnasiyê Ya Pêşin.....	14
Himdarê Bavê Romanên Kurdi.....	16
Mêrxasek D1 Dîlê Gel da.....	20
Tolstoy.....	23
Heftê Çanda Kurdistanê.....	26
Zembilfroş.....	27
Serpêhatik.....	29

Xwendevanên Delal,

Heta niha 6 hejmarên Roja Nû gihîştin destên we, kovara Roja Nû, wek kovareke çandi, edebi û huneri saleke xwe tîji kir. Ji vî şunda em dîxwazîna kovareke hîn ji baştir bîweşînin. Ji ber vê yekê, hûn xwendevanên me, dî warê şandîna nivîsan, alîkarîya aborî û dî warê belavkirîna kovarê da destê xwe dirêjî me bikin, emê kovareke hîn ji pêşketî bîhînin we.

B1 Sîlavên Germin
Roja Nû

SAL : 6
HEJMAR: 49

XWEDÎ : Komela Karkerên Kurdistan
L1 Swêd
BERPIRSÎYAR : Rohat
NAVNIŞAN : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm
TELEFON : 08-328251
HESAP NO : PG. 458980-0

UTGÎVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGÎVARE : Rohat
ADRESS : Karlbergsv. 32B nb
113 27 Stockholm
PG : 458980-0

J1 XWENDEVANAN

Hevalên hêja

Ez pêşveçûna we dîxwazim û we sî lav dîkîm. Bîrayên Kurd, ez Necmettin Gerdu niha lî Romanyê dimînim, heta niha hemû hejmarên Roja Nu gîhiştin destê min. Lê ez, nîzanîm we ki çawa ezê buhayê wan jî we ra bî rêkîm. Jî bo vê yekê, ez hêviya ber sîva we dipêim.

Necmettin Gerdu
Romanya

Hevalên Hêja

Geli heval û rêberê gelê Kurd ez gelek spas û dîlxweşiyê xwe jî we ra dîşînim. Ez serfiraziyê we dîxwazim.

Dema ez lî kovara Roja Nû dînhêrîm bîhna azadiya Kurdistanê tê ber pozê min, ez gelek şa dibîm, derdê dilê min hevki belav dibe, bîna min fîreh dibe.

Bî sîlavên Germin
M. Zeki Demir
Elmanya Federal

Redaksiyona ROJA NÛ' ra,

Pey şeş salên dûr û dirêj va kovara Roja Nû dî warê literatura kurdî da gîhişte merhaleke nû û bîlînd. Çanda gelekî jî stran, roman, çîrok serpêhatiya û hwd. pêktê. Nav perên Roja NÛ' da bes nînbî jî ev, lê gor şert û zîrûfên welat gel û çanda îroyîn, em bîdne ber çavên xwe, ne hindîkî jî.

Xwenddevaneki organeke siyasi yan jî ya çandî, ne tenê xwendevane, ew usa jî warê nivîsan, lêkolîn, wêne û hwd. ser milên wî gelek kar û bar hene.

Bî bir û baweriyên min, wextê kovara Roja Nû û xwendevanên wê bîbîn yek, gelek pîrsên pêş kovara me û çanda me yê jî ortê rabin.

Bo we serfirazî û serketîn bo me kar û bar. Sîlavên germin.

XEZAL
Swêd

Jî Roja Nû ra

Hevalên Hêja

Jî ber derxistîna kovara Roja Nû kovara cîwan û hêja, ez we spas dîkîm, pêşketîna jî we ra dîxwazim.

Çawa tê zanîn, Roja Nû tenê bî kurdî derdikeve, ev yeka tîştêki gelek başe. Lê, ez û kesên wek min zî manê kurdî hêdî hêdî jî nû va fêr dibîm, dî nav rûpelên kovarê da carîna hîm peyvên nenas lî ber çavên me dîkevî û em tînaghên. Jî ber vê yekê jî hun dîkarî wek ferhengê Kurdi-Tîrki, Kurdi-Erebî vî rûpelî amadê bîkîm.

Herçar hejmarên "Roja NÛ" min stand. Ez dîlxweşiya xwe nîzanîm, çawa bînivîsinîm. Ez bawer dîkîm ku, kovara Roja Nû bî xebatên xwe yê hêja va, jî bo me wek "Rojeke NÛ" ye. Ev kovara delal dî vê rewşa îroyîn da, xebateke gelek gîranbahaye. Wê, dî dilê welatparêzên kurd da ciheki pîr mezî gîrt û berdeyam bîke. Bo xebatên we yê jîr, ez we pîroz dîkîm, jîyîneke dirêj û serfirazîke mezî ez jî we ra dîxwazim.

Bîji Azadiya Kurdistanê

Bî slavên germin
Xîzan

Keça Kurd
Fatê
Elmanya Federal

ÇEND ETABÊN PÊŞTAÇÛNA

ZIMAN Û ZARAVÊN KURDÎ

HESENE USO

Gelê kurd lî Rojhîlata Navîn, geleki pîr kevne. Dî sedsaliya 16 an da, dewletên Îrani û Osmani welatên kurdan dî nav xwe da beşkirin. Paşî şerê cihanê yê yekemin, vê carê Kurdîstan bû çar beşan. Gelê kurd bî vê yekê ra razi nebû. Jî bona mafên xwe yê netewî, gelê me çek da destê xwe û lî dîji neyarên zordest derket. Dîjîmî serhildanên kurdan dî nav xwinê da dixeniqandin, gundên kurdan xîrab dîkîrîn, dîcedandin gel jî welat dîrxîn, yan jî dîxwastî dî nav tirkan, ereban, farîsan da wan belav bîkî û bihelînî.

Mixabî, wusan jî, jî kurdan ra lî hev nehat weki dewletên xwe ava bîkî. Bî vî tehri, vê rewşê, tesireke gelek mezî ser zîmanê kurdî û zaravên wî hişt.

Cara pêşî, bî nivîskî, dî sed salîya 7'an da, nîmûneyên kurdî hatî nivîsandî.

Dî sala 1963'an da lî Brukselê pirtûkeke Lois Blau, bî navê "Le Probleme Kurd" hat çapkirî, dî vê pirtûkê da, rûpelê 14'an da, çawa Minorski dîde kîvşê, weki zîmanê kurdî jî zîmanê farîsî lap tê cudakîrî û zîmanekî bî serê xwe ye, Morgan jî ev yeka rast dîtiye û gotiye ku, ew ne zaravê farîsiye. Ew zîmanekî lap cudaye.

KARÊN LÎ SER GRAMATÎKA KURDÎ

Gramatika zîmanê kurdî ya pêşî Eli Termukî nivîsiye. Lê cara pêşî lî Ewrûpê pirtûkeke gramatika zîmanê kurdî dî sala 1787'an da, jî aliyê Garzonî da hat weşandin, Ew dî sedsaliya 18'an da, dî nav kurdên hêla Amadiyê da geriyaye û dî nav wan da maye. Vê gramatika Garzonî, dî nav zane û ronakbîren Ewrûpê da, hewaskarîke mezî berbî zîmanê kurdî pêşta anî. Pey vê yekê ra, gelek zane û zîmanzanên Ewrûpî, wek Pot, Berezî, Xodzka despêkîrîn, bî pîrsa kurdan û zîmanê kurdî va mijûl bûn. Dî salên 1836-1837 Xyorulê gelek lêgerî û bend lî ser zîman û lî ser kurdan weşandin. Wî diyar kîr weki zaravên kurdî lî bakûrê û başûrê jî hev tî cudakîrîn, lê bî gehên hemû peyvî yekî, yê ku bî kurmancî dipeyvî, jî zaravê soranî jî fem dîkî.

Xebatên Rödiger û Pot baweriya cihê zîmanê kurdî dî nava zîmanên Îranî da xurt kîrîn. Dî nivê sedsaliya 19'an da zanayê ûris A. Jaba, Dîtel, Abovyan, Berezî, Lerx û yê mayî, bî zîman, zarav û etnografîya kurdan va mijul bûn, ew pêşta bîrîn. Dîtel sê salan lî bajarên Mêrdînê, Diyarbekîrê, Nîzîpê û Urfayê geriya û gelek melûmat lî ser kurdan berevkîrîn.

Lî Tîblîsê, dî sala 1848'an da, dî nav rûpelên rojname "Kavkazê" gelek vekolî û bendên Abovyan lî ser kurdan û zîmanê wan hatî çapkirî. Abovyan zîmanê kurdî dî wê dewrê da, lî ser du beşan parvedîkîr, zazakî û kurmancî. Zanekî bî navê Lerx jî, gelek salan lî bajarên Mêrdînê, Cîzîrê, Dersîmê, Muşê, Diyarbekîrê, Xarpût, Malatîyê û Erzurmê geriya û lî ser çanda kurdan xebîti. Ev zîmanzanê jî, çawa diyar dîke, weki pênc zaravên zîmanê kurdî hene, Kurmancî Lurî, Kelhorî, Goranî û Zazakî.

Aleksandîr Jaba xudanê ferhenga kurdî û Rûsiye, dî ferhenga wî da nêzkaya 15 hezar peyv hene.

Dî sedsaliya 20'an da, dora sala 1930'an da, dewreke nû, dî dî roka gelê kurd da vedîbe, jî bo azadiya gel, tevgerên netewî bejî dîdî û kurd jî, jî xewa dîlî û bîndestîyê hişyar dîbî. Jî bona xwenasiya netewî pêwîst bû, weki gelê kurd zîman û diroka xwe baş

nas bike. Hê dî salên 1920-22'an da hukmeta Tirkîyê kovar, rojname rêxistin û klubên kurdan lî Stenbolê, Bitisê, Diyarbekir, Muşê, Erzurmê û Musulê qedexa dikirin. Nunerên çanda kurdi jî Tirkîyê çûbû ne Suriyê û Lubnanê, wan lî vê derê kovarên Hawar, Roja Nu û Stêr çap dikirin. Lî Kurdîstana Iraqê bajarên Suleymaniyê û wusan jî Bexdat bûbû navça çanda kurdi. Dî wan salan da gelek kovar û rojname bî zîmanê kurdi (bî her du zaravan) va derdiketin wek Gelavej, Jîn, Nîzar, Hetav, Hiwa, Ronah, Dengê Gih Teze... Dî nav rûpelên van weşanan da gelek vêkolîn, serpêhati û bend lî ser zîmanê kurdi û zaravên wi dihatin nivisandin. Kurdan bî xwe-xwe despêkîrîn zîman, zaravên kurdi, dirok û etnografya xwe va mijûl bûn. Dî nav wan da hêjaye mirov bir bine navê Celadet Bedîrxan û Kamuran Bedîrxan. Çawa tê zanin, Celadet redaktorê kovara Hawar bû. Celadet û Kamuran wedeki gelek dirêj jî, lî ser ferhenga Kurdi-Fransî karkîrîn. Wan nêzkaya 60 hezar peyv berevkîrîn. Lê mîxabin, Celadet dî 1953'an da çû ser heqîya xwe û wusan jî ew ferheng nehate çapkirin. Destnîvisara wê ferhengê lî şamê lî bal pireka wi Rewşan Bedîrxanê ma. Xebatên wan herdu lawên kurdan lî ser zîman û zaravên kurdi gelek berbiçavîn. Wusan jî Celadet tevî kurdzan R. Lescot pirtûka gramatika kurdi dan weşandin. Jî aliyê din da karên Tefîk Wehbi, dî warê zîmanê kurdi û beşkîrîna zaravên kurdi da gelek hêjane, ew lî hemû Kurdîstanê geriyaye û hemû zaravên kurdi fêr bûye. Pêwîste mirov karên Seyit Koban û Nuri Eli Emin û yê mayîn jî bir neke. Dî sala 1951'an da pirtûka Tefîk Wehbi lî ser zîman û zaravên kurdi çap dibe.

Tefîk Wehbi dî zîmanê kurdi da çar zaravên bîngehîn tespît dike wek kurmançî, Lurî, Goranî û Zazakî.

Dema bî alîkariya Freyman û H. Orbelî va lî Leningradê beşa kurdzaniyê vebû, kurdzani rabû lî dereceke hin jî bilind.

Nava zîmanzan û kurdzanê Sovyetê da hêjaye mirov navê Qanadê Kurdo û navên yê din bir bine, wek Heciyê Cîndî, Çerkez Bakaev, Îvan Farîzof, Julian Avalîanî, Sukerman, Maksîmê Xemo, Ordîxanê Celîl û yê mayîn. Bî taybetî Qanadê Kurdo bîngehîn zîmanê kurdi baş vekolandiye û lî ser zaravên kurdi karîna baş pêkaniye. Qanadê Kurdo jî, zaravên dî zîmanê kurdi da hene, wek du zaravên bîngehîn nişan dide, Kurmançî û Soranî. Wi warê dengkîrîna van zaravan jî wek lî jêr rêzkîriye:

Lî Kurdîstana Tirkîyê Kurmançî tê axaftin, wek kurdên bajarên Mêrdînê, Hekariyê, Bitlisê, Muşê, Wanê, Erzurmê, Qerekilîsê, Erzîncanê, Xarpûtê. Lî Kurdîstana Îranê bajarê Xoresanê û jî gola Rêzayê berbi rojavayê kurmançî tê dengkîrîn.


Lî Kurdîstana Iraqê, bajarên Musul, Akriyê, Zaxoyê, Amadyê, Dehok û Çiyayên Şengalê, wusan jî kurdên lî Suriyê û yekitiya Sovyet jî, bî zaravê Kurmançî dipeyivîn.

Lî Kurdîstana Îranê, dî bajarên Mahabat, Saqîz, Bokan, Bane û Senendêjê bî zaravê soranî deng dikin. Lî Kurdîstana Iraqê, dî bajarên Rewanduzê, Erbilê, Suleymaniyê û Kerkukê jî, bî zaravê Soranî tê dengkîrîn.

Îro edebiyata Kurdan ser himê du zaravên kurdi yê mezin pêşta diçe, Kurmançî û Soranî.

Edebîyata Kurdan ya klasîk bî Kurmançî hatiye nivisandin, van nivîskarên bî nav û deng bî Kurmançî efrandinên xwe pêk anîne, Eliyê Herîrî, Meleyê Cîzîrî, Feqiyê Teyran, Ahmedê Xanê, Îsmayîl Beyazîdî, Mele Beyazîdî, Pertev Begê Hekarî û gelekên mayîn.

Edebîyata Kurdi ya bî zaravê Soranî dî despêka sedsaliya 15'an da hatiye nivisandin û heta îro jî dajo, bî vi zaravî va, gelek nivîskarên kurd efrandinên zor hêja nivisandinê, wek Nalî, Kurdi Selîmê, Hacı Qadır Qoyî û yê mayîn.



HEVPEYVÎNEK

BI M. E. BOZARSLAN VA

PIRS: Jîbo pêşxîstina bêjeya (edebiyat) Kurdi, bî baweriya we pêwîst e çî kar bê kirin? Mîrov çawa dîkare dijwari û sêrêşîyan jî meydanê rake? Bêjeya Kurdi çawa dîkare xwe bigihîne tanga bêjeyên hevdem û bibe bêjeyeke nûjen?

BERSIV: Bêjeya Kurdi dî mêj da, xasma dî dewra klasiki da gelek pêşketi û têkûz bû. Helbestên Melayê Cîziri, Eliyê Heriri, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyi, Siyahpoş, Pertew Begê Hekari, Nali, Hacı Qadirê Koyî û wd. ravayê me dîdın ku bêjeya kurdi hingê dî tengeke gelek bî lînd da bûye. Em bî hêsani dîkarın bêjın ku bêjeya kurdi wê demê dî dewlemendi û rûmeta xwe da jî bêjeyên gelên dın ne kêmtir bûye. Hozanê Kurd ê nemir Melayê Cîziri dî helbesteke xwe da weha gotiye:
*"Ger lu'lu'ê mensûr-i jî nezmê tu dîxwazi
Wer şî'rê Mele bîn, te bî şîrazî çî hacet."*

Yani, eger tu jî helbestên mîrariyên belavbûyi dîxwazi, were helbestên Melê bibîne; çî hewceyiya te bî Hafîzê Şîrazî heye!

Hafîzê Şîrazî, yek jî hozanên Faris ên mezintîrîn bûye. Melayê Cîziri bî peyva xwe ya jorin, meydan jî Hafîzê Şîrazî ra xwendîye û iddia kiriye ku helbestên wî jî yên Hafîzê Şîrazî hêjatîrîn. Bî rastî jî helbestên kurdi yên wê dewrê, ku nişan û sembola bêje bûne, jî helbestên Farisî û Tırki û Erebi ne paştatîr bûne û wê demê jî, iro jî jîbo gelê Kurd rûsîpitiyeke mezin anîne. Em Kurd dîkarın tım û tım bî wan bîpesının.

Bê guman, yek jî bêjezan û birbîr û hozanên Kurd ên mezintîrîn ên wê demê jî Xaniyê nemir bûye. Xani, bî efirandîna destaneke wek "Mem û Zîn"ê, bêjeya kurdi gîhandîye tepelê. Her weha nişan daye û îspat kiriye ku zımanê Kurdi ne tenê jî helbestên kurt ra, lê jî e firandîna eserên weha dirêj û gewre ra jî hêgîne.

Dî dawîya sedsala 19'an û despêka sedsala 20'i da em pêştaçûneke xurt dî bêjeya kurdi da, bî weşandîna kovarên "Kurdistan", "Roji Kurd", "Hetawî Kurd", "Jin", û dîsa "Kurdistan" dîbinın. Hozan û bêjezan û nivîskarên Kurd dî wan kovaran da xebitîne ku bêjeya Kurdi bigihînin tanga bêjeyên hevdem, rûpelên wan kovaran bî helbest û kurteçîrok û meselok û piyesên Kurdi xemilandîne. Hozanê marşa "Newroz" Pîremerd, Evdîrehîm Rehmi, Hilmiyê Sîwêreki, Law Reşîd, Mihemed Mihri, Qazizade Mîstêfa Şewqî çend jî nivîskar û hozanên wê dewrê û wan kovaran bûne.

DEWRA TARÎ Û ÇIRUSKA HAWARÊ

Belam piştê 1923'yan bî taybetî lî Kurdistan'a jorin, pêştêçûna bêjeya Kurdi rawestaye. Em hemû dîzanın ku sedemê vê rawestanê eve ku dewleta Tırkan zıman û bêje û çandeya Kurdi qedexe kiriye. Em bî hêsani dîkarın bêjın ku sazkirîna Komara Tırkiyê sala 1923'yan jî bo gelê Kurd û her weha jîbo zıman û bêje û çandeya Kurdi bûye despêka dewreke reş û tari. Ev dewra reş û tari hê jî dom dîke. Jî ber ku bî sazkirîna Komara Tırkiyê ra her tîştê Kurdi hat qedexekirin û dewleta Tırkan siyaseta tunekirîna Kurdan û pişaftîna wan ajot û hê jî dajo, piştî 1923'yan jî nava Kurdên Kurdistan'a jorin hozan

û niviskar û bêjezanên Kurdnivîs derneketin. Çend Kurdên ku bûne bêjezan û niviskar ji, jibo ku ji nan û nimetên dewleta Tırkan mê fadar bîbîn û parek bîstînin, bî Tırki nivîsine û ji bêjeya Tırki ra xîzmet kirine, nuha ji dîkîn.

Lê belê, dî wê dewra reş û tari a çıriskê pêketiye û ronayi daye. Ew ji çıriska kovara "Hawar" bûye. Celadet Bedirxanê rehmetî û heval û heykarên wî, bî weşandina kovara "Hawar" hêz dane xwe ku zîman û bêje û çandeya Kurdi pêşta bîbîn û bikemilînin. Bî rasti, dî wê hêzdana xwe da bî ser ji ketine. Hozan û niviskarên ku lî dora "Hawar"ê civiyane hem dî helbestan da, hem ji dî dûznî visaran da bêje û zîmanê Kurdi gelek pêşta bîrine û kemilandine.

Lê mîxabîn ku piştê tevgera "Hawar"ê, dî meydana bêje da tevgerê weha berçav û xurt çênebûye. Gerçî lî Kurdîstana Jêrin û bî taybêfî bî zarê Soranî pêşteçûna bêjeya Kurdi hindîk be jî dom kiriye, lewra zîmanê Kurdi lî wir nehatiye qedexekirin; belam lî Kurdistan'a jorin û dî zarê Kurmancî da tevgerê xurt nehatiye ditîn. Dî salên 1960'an da lî Stanbolê kovarên "Dicle-Fîrat" û "Deng", lî Enqerê jî kovara "Yeni Akîş" derketin. Belam dewleta Tırkan nehîşt ku emrê wan kovaran dirêj bibe û xîzmeta wan dom bike, tavil ew girtin.

Jî ber zordestiya dewleta Tırkan, mîxabîn ku bêjeya kurdi gelek paşta maye. Dî van salên dûwayin da hîn niviskar û hozanên Kurdi nî vis derketine. Ev bûyereka pîrr gîringe û hêviyeke baş dîde mîrov. Belam pîrraniya wan niviskar û hozanên Kurd, berê xwe dane meydana helbestan û helbest dînivîsîn. Elbet nivîsîna helbestan başe û pêwîste. Belam bêjeyek, tenê jî helbestan pêknayê. Roman, çirok, kurteçîrok, meselok, piyes, serpêhati, çivanok, tiştanok jî pêwîst in û hemû dikevîn têdayiya peyvîka "bêje". Aha dî wan tewiran da bêjeya me gelek paşta maye. Ev rastiyeke tal e, lê em çî bîkîn ku rastî ye.

MIROV DİKARE ÇI BIKE?

Mîrov çawa dîkare bêjeya Kurdi pêşta bibe? Bêjeya Kurdi çawa dîkare xwe bîgihîne tanga bêjeyên hevdem û bibe bêyeyeke nûjen?

Bersîva van pîrsan, bê guman ne hêsan e. Belam mîrov dîkare bêje ku pêşxistîna bêjeya Kurdi, beriya her tiştî lî ser xîret û xebat û himmeta niviskar û bêjezan û hozanên Kurd e. Jibo pêşxistîna bêjeyek mîrov nîkare bernamena, plan û projena sererast bike û paşê jî dest bî pêkanîna wan bike. Eger hîn bernameyên weha bîn amadekîrin jî, pêkanîna wan disa lî ser xîret û xebata niviskarên û bêjezanan û hozanan dimîne. Nexu ev bar lî ser milên wan e. Bî ditîna mîn, dîvê ku niviskar û hozan û bêjezanên Kurd hêz bîdînin xwe û bîxebitînin jibo ku vî karê gîring pêkbinînin û vî barê gîrîran rakînin.

Lî vîr şoleka gelek gîring derdîkeve pêşberê me. Ew jî zanîna zîmanê Kurdiye. Kesê ku bîxwaze dî pêşxistîna bêjeya kurdi da beşdar bibe û dî vê rê da xîzmet bike, dîvê ku bîzane zîmanê Kurdi bî awayekî rast bî kar bîne. Ev, merceki bîngihîne. Jibo ku mîrov bîkare û bîzane zîmanê Kurdi rast bî kar bîne, ne pêwîste ku mîrov zîmanzan be, pîsporê zîmanê Kurdi be, awa û bîngelokên zîmanê Kurdi û rêzîmana Kurdi bî temamî bîzane. Belam pêwîste, hem jî mutleq pêwîste ku mîrov zîmanê Kurdi bî awayekî rast bî kar bîne û bînivîse. Eger mîrov dî nivîsînê da zîmanê Kurdi şaş û xelet bî kar bîne û şaşiyên rêzîmanî bike, hîngê dibe ku ziyana wê nivîsînê jî fêda wê zêdetîr bibe. Lewra şaşî û xeletî eger dî nava gel da, dî nava xwendoxan da belav bîbîn, careka dîn rakîrîna wan û rastkîrîna wan gelek zor dibe.

Kesê ku bixwaze bî Kurdi binivise, xeyn jî zanina nivîsina bî Kurdi, divê ku bî Kurdi bifikire jî. Eger mirov bî zîmaneki biyani mesela bî Tırki yan bî Erebi bifikire û bî Kurdi binivise, hingê dibe ku şaşiyên mezin jî mirov peyda bînin. Lewra di her zîmaneki da peyvîk û terim û peyvên pêşiyên ên teybetiyên bî wî zîmani ne û pîraniya wan li zîmanên din nayên. Her weha awa û bîngelokên zîmanan, mesela awayê sazîrîna pevêkan jî hev cuda ne. Eger mirov bî zîmaneki biyani bifikire û bî Kurdi binivise, dibe ku mirov pevêkên Kurdi jî li gora awayê pevêkên wî zîmani saz bike. Ev jî di be şaşiyê mezin.

Şoleka din jî bêjezaniye, yanî zanina bêjeyê yê bî awayeki gîştî. Ev zanin jî bî xwendina pirtûkên bêjeyî bî dest dîkeve. Kesên ku bixwazin jî bêjeya Kurdi ra xîzmet bikin û di pêşxistina wê da beşdar bînin, divê ku pîr û pîr bixwinin jî. Erê, jî bo nivîsina helbest û çîrok û roman û wê, divê ku mirov rewşa siyasi û cîvaki ya Kurdîstanê binase, bî zîman û çande û toreyên gelê Kurd bîzanê û her weha divê ku hêgîni û huner jî di mirov da hebe. Balam ev ne bes e. Pîngêr jî pêwîst e. Pîngêr jî bî xwendina bêjeyên cure-cure çêdibe. Hem eserên Kurdi, hem jî yên biyani divê ku pîr bînin xwendin. Dema ku em bala xwe didin bêjeyên biyaniyan, em pêştacû-neke weha mîsêwa di wan da dibînin. Pêştacûna bêjeyan bî pêştacûna jiyana gelan ra, bî pêştacûna rewşên siyasi û cîvaki û abûrî ra meşiyaye û dom kirîye, nuha jî dom dîke.

Divê ku nivîskarên Kurd jî jî aliyek va bêjeyên cure-cure bîxwinin, pêşketina di wan da bînin û bîzanin, jî aliyekî din va jî bûyerên ku li Kurdîstanê qewîmîne û diqewîmin bîzanin û di romanîya wan bûyeran da rewşa gelê Kurd jî roman û kurteçîrokên xwe ra bikin babet, rewşa gelê Kurd a siyasi, cîvaki, çandeyî, abûrî, dinî û toreyî di eserên xwe da binexşînin, salix bînin û bî rastî bînin wan bûyeran, wê rewşê binin ber çavan, ber çavên xwendokên Kurd.

GIRINGÎYA XWENDOXAN

Li vir dijwariyeke din jî derdîkeve pêşberê me. Ew jî kêmayîya xwendokên Kurd e. Mixabîn ku kitleyeke fire ya xwendokan di nava Kurdên Kurdîstana jorin da hêj pêknahatiye. Semedê vê kêmayîyê jî di sa qedexkirîna zîman û bêjeya Kurdi ye. Gelê Kurd mecal û fersend neditiye ku bî Kurdi bixwine. Jî ber vê yekê jî xwendokên Kurd kêmin, di sa jî ber vê yekê eserên Kurdi tenê di nava kesên zana û xwenda da belav dibînin. Ev jî qim nake. Divê ku bêjeya Kurdi jî wek bêjeyên din bigîje gel, bigîje kitleyeke fire ya xwendokên Kurd, jî gel ra bibe mal. Hebûna nivîskar û hozanan jî bo pêşketina bêjeyek çawa pêwîst e, hebûna kitleyeka mezin a xwendokan jî jî bo pêşketina wê bêjeyê wisa pêwîst e. Em dikarin pêwendiyên bêjeyê û xwendok bîşîbinin pêwendiyên baranê û axê. Barana ku li axê dibare, xêr û bîr çêdîke. Belam barana ku li ser kevîran dibare, tewş diçe û tu xêr û bêrek jê peyda nabe. Bêje jî, eger xwendokên wê tunebin tewş û bêxêr diçe, fêde jê nayê ditin, lê ku xwendokên wê hebin, ew di dilê wan da ci digire, dibe semedê tîgî hiştin û serwestiya wan, evina gel û welat di dilê wan da zexmtîr dîke. Jî ber vê yekê, divê ku em Kurd jî girîngîyeke mezin bînin hebûna xwendokan.

Gerçî di rewşa îroyin da amadekirîna û pêkanîna kitleyeke fire ya xwendokan di Kurdîstana jorin da gelek zor e, Belam li Ewropayê îro gelek Kurd hene. Eger xebateke gurr bê kirin, ez bawer dikim ku dê mîmkun be ku kitleyeke xwendokan di nava Kurdên Ewropayê da bê hazîrkîrîna. Kitleyeke wisa ku hewesa xwendina pirtûkên

Kurdi bîke û wan bîxwine. Bî ditîna mîn ev kar jî bî komeleyên Kurdan dibe. Îro lî her derê Ewropayê komeleyên kurdan hene, pîrr hindîk imkan jî dî destê wan da hene. Divê ku ev komele, jî aliyek va jîbo Kurdên nexwendî qursên xwendin û nivîsinê vekin, jî a liyek va jî Kurdên ku xwendin û nivîsinê dîzanan bihewîsinin xwenîna pirtûkên Kurdi.

BÊJE Û ŞOLA RIZGARIYA KURDISTANÊ

PIRS : Çawa ku hûn dîzanan, jî destpêka sedsala 20'i heta nuha, tevgera rîzgariya Kurdistanê her ku diçe bilind û firek dibe, bî ditîna we heta nuha şola rîzgari û azadiyê bî çî rengî dî xebata bêjeyî û hûnerî da ci girtîne? Jî vîr şûn da mirov dikare çî bîke?

BERSÎV : Şola rîzgariya Kurdistanê û azadiya gelê Kurd, jîbo me Kurdan şola pêşin û girîngtirin e. Tîştêki tabîi ye ku ev şol dî bêjeya Kurdi û hûnerê Kurdi da ciyê pêşin bigire, çawa ku diğî re jî. Şola rîzgari û azadiyê dî dewra Xaniyê nemir da jî şoleka girîng bûye. Xani dî despêka "Mem û Zîn"ê da lî ser vê şolê hîn parçeyên rûmetbilind nivîsine. Mesela weha gotiye:

"Ez mame dî hikmeta xwedê da
Kurmanc-î dî dewleta dîne da

aya bî çî wechi mane mehrûm
bîlcumle jîbo çî bûne mehkûm"

Pîştê Xanê jî hozanên wek hacı Qadirê Koyî û Şex Evdîrehmanê Axtepiyî, dî despêka sedsala 20'i da jî wek Goran û Pîremerd û Ev dîrehim Rehmi, her lî ser vê şolê û lî ser belengazî û bêkesî û bîndestîya gelê Kurd nivîsine. Ev şol bûye Babetê "Hawar"ê jî. Pa şê jîbî helbestên hozanên wek Hejar û Cegerxwîn û Hêmin û wd. dom kîriye. Hozanên Kurd ên nûhati jî her lî ser vê şolê dînivîsin.

Dî meydana hûner da jî em dikarin operaya Kurdi "Dayika Nîştîman" wek numûneyek nişan bîdî. Ev opera, sala 1945'an lî Kurdistanê na Rojhilat lî bajarê Mehabadê hatiye nivîsin û leystî. Hîngê Koma Kurd a Mehabadê hatibû sazîrîn. Dî operayê da dayîkek Kurdistanê temsîl dîke. Dayîk dil dîkeve destê sê keleşan, gelek êş û azar tîn serê wê, belam paşê bî xebat û xîret û têkoşîna zarûkên xwe jî dîlîtiyê rîzgar dibe û diğîje azadiyê. Nivîsin û leystîna vê operayê jî nişanê me dîde ku, dema ku gelê Kurd mecala derxistîna dengê xwe dibîne her lî ser rîzgari û azadiyê diğîre. Lewra şola wî ya pêşin û girîngtirin ew e. Ev şol lî Kurdistanê jêrin jî bûye babetê çend şanoyan.

Disa dî meydana hûner da em dibînin ku şola rîzgari û azadiyê van salên dûwayin jîbo dengbêjên Kurd jî bûye babet. Lî ser vê şolê gelek marş û helbest û stran jî aliyê dengbêjên Kurd va hatîne gotî û dengên wan ên xweş ketîne kasetan, lî nava gelê Kurd belav bûne. Tesîra van kasetan lî ser şîyarî û têgîhiştîna gelê Kurd gelek çêbûye û çêdibe. Dengbêjên Kurd bî wan kasetan xîzmeteke pîrr mezî û hêja kirîne, nuha jî wê xîzmeta xwe didomînin. Belam diğel vê xîzmeta mezî jî, hînek jî dengbêjên Kurd dîkevî şaşîyek. Ew şaşî jî ev e ku hîn dengbêjên me stranên Kurdi yê geli diğuhêrî, hîn parçeyên welatevîni û şorîşgerî lî wan zêde dikî. Ev jî du alîyan ve şaşî ye û -bîla dengbêjên me lî dilê xwe negîrî -neheqî ye. Jî aliyek va dibe semedê guherîna stranên geli. Çawa ku em hemî dîzanan, stranên geli jî aliyê geli va bî sed salan berê hatîne çêkîrî û belav bûne, jî gel ra bûne mal. Eger her dengbêjek îro rabe parçena jî wan derxe û parçena lî wan zêde bî-

ke û bî wi awayê guherti wan têxe kasetan û belav bike, hingê stranên me yên geli dê eslê xwe û orijinaliya xwe wînda bîkin . Ji aliyekî din va ji ev awa hunerê Kurdi stawr dihêle, dengbêjan dixwe rîya xêsan, rîya guhartinê. Eger ev awa dom bike, mirov ditirse ku dengbêj û hûnermendên Kurd êdî pêwîst nebin ku jibo peyda kirina tiştên nû, jibo afirandina parçeyên nû û dewlemendkirina hunerê Kurdi hişê xwe zêde bişixulînin û serê xwe bêşînin. Ev jî dibe sebebê ku hunerê Kurdi dê di hola vala da bigere û pêşta neçe, nekemile, nîkaribe xwe bigihîne tanga hunerên hevdem. Kesên hûnermend, divê ku tiştên heyî bîparêzî û tiştên nû çêkin, biafirînin. Hingê huner dewlênd dibe, pêşta diçe û dikemile.

Belam di vî babetî da jî kêmayiyeka mezîn û valayiyeka kûr di bêjeya Kurdi da heye. Ew jî ev e ku li ser şola rîzgariya Kurdistanê û azadiya gelê Kurd roman û kurteçirok nehatine nivîsin. Çend pirtûkên serpêhatiyan hatine nivîsin. Wek "Doza Kurdistan" a Zînnar Sîlopî, "Kurdistan Tarîhinde Dersim" a Dr. Nûrî Dêrsimî û "Ma Vie de Kurde" a Dr. Nûreddin Zaza. Lê belê, ev jî bî zîmanên biyani ne. Bê guman ev pirtûk hemî girîngî û hêja ne. Belam di vîya ku bî Kurdi bihatina nivîsin. jî ber ku ne bî Kurdîne, tabîi ye ku jî bêjeya Kurdi nayên tewkîrin.

Jî vir şûn da mirov dikare çî bike?

Bî ditîna min, dagirtîna vê valayiyê û temamkirina vê kêmayiyê disa li ser xîret û himmet û xebata nivîskarên Kurd e. Nivîskarên ku jî destê wan tê, divê ku bala xwe bîdînin vî babetî û li ser şola rîzgariya Kurdistanê û azadiya gelê Kurd, li ser wan qetliam û êş û azarên nebûyî yên ku dijmin anîne serê gelê Kurd, roman û kurteçirokna binivîsin, wan bûyeran bî roman û kurteçirokên xwe binî ber çavê xwendoxan.

Em hêvidar in ku hîn nivîskarên weha jî nava gelê Kurd derkevin. Her weha em hêvidar in ku jî nava nivîskarên Kurd ên iroyîn jî hîn kes bala xwe bîdînin ser vî babetî û di vê meydanê da jî qelemên xwe bişixulînin, jibo dagirtîna vê valayiyê bixebitînin. Yan na, mirov nîkare di vî babetî da jî tu bername û proje û plan sererast bike û paşê jî pêkîne.

WERGERANDINA PIRTÛKÊN BIYANÎ

PIRS : Bî ditîna me, iro şoleka bêjeya Kurdi jî, kêmayiya eserên biyani ye di zîmanê Kurdi da. Jibo wergerandina hîn eserên gelên cuda, wek çirok, helbest, serpêhati û romanên, çawa ku em dibînin karekî wîsa zêde li ber çavan tune. Bî ditîna we, mirov çawa dikare vê kêmayiyê jî meydanê rake û vê valayiyê dagire?

BERSIV : Li Kurdistanê jêrin û li Îraqê ev çend sal e ku hîn eserên bêjeyî jî zîmanên biyani yên cure-cure tînin wergerandin bo kurdi. Di nava wan da helbestên Pûşkin, Nazîm Hikmet, û Pablo Nerû da, romana Maksîm Gorkî "Dayik" û du-sê romanên Yaşar Kemal jî hene. Belam gelek mîxabin ku Kurdên Kurdistanê jorîn nîkarînin jî wan mefadar bînin. Lewra ew hemî bî tipên erebî hatine çapkirin, hemahema gişt jî hatine wergerandin bo zarê Soranî. Lê bî zarê Kurmançî û bî tipên Latîni, eserên bêjeyî yên biyani nehatine wergerandin. Elbet ev kêmayî ye. Bêjeyeka têkûz, divê ku xwediyê wergeran nan be jî.

Lê belê, eger em bî çavekî rastînin li rewşa xwe ya iroyîn te- maşe bîkin, bî ditîna min em ê bîbin ku ev, ne şoleka wîsa acîl e. Beriya ku em dest bavêjin şola wergerana pirtûkên bêjeyî yên biyani, hîn şolên di hene ku divê ku em wan safî bîkin. Yek jî wan şolan ev e: Divê ku em berê bêjeya Kurdi bî xwe pêşta bînin, bîkermîlînin, têkûz bîkin, bî roman û çirok û meselok û kurteçirok û pi

yesan dewlemend bîkîn, binîn rewşeke wîsa ku em bîkarîn bêjin "a-ha bêjeya me ev e". Eger em rewşa Kurdistanê jorîn bîdîn ber çavê xwe û bî rastîbîni bîfîkîrîn, dîvê ku em lî xwe bê nîkîrê ku em iro nîkarîn iddiyeyeka weha bîkîn. Jîmareya pîrtûkên bêjeyî yê nî Kurdî yê nî bî tipê nî Latîni, ez bawer nakim ku jî 50'yi derbas bûbe.

Şoleka dî jî ev e: Çawa ku lî jor jî mî nî qal kîr, dîvê ku em berê kîtlekî xwendoxên bêjeya Kurdî û zîmanê Kurdî pêkbinîn. Kîtlekî wîsa ku lî eserên Kurdî yê nî bêjeyî bîgere, wan bîevîne û bîxwîne, hî nî wan bîbe, têhna xwe bîde ser wan. Berîya ku em vê şolê safî bîkîn eger eserên bîyanî bê nî wergerandî nî bo zîmanê Kurdî, ez bawer nakim ku bala gel bîkîşî nî. Peyveka pêşîyan a Kurdî weha dîbêje: " Her tîşt xweşe dî wextê xwe da".

Şoleka dî jî ku safîkîrîna wê pêwîst e, ev e: Wergerandîna pîrtûkên bêjeyî jî zîmanek bo zîmanekî dî, karekî gelek gîring e, pîsporî dîxwaze, Kesê ku vî karî bîke, dîvê ku bî herdu zîmanan jî pîrr baş bîzane, jî herdu zîmanan ra jî fermanrewa be. Ev jî ne bese. Dîvê ku bêjezan be, bîkare bî awa û şîweyekî bêjeyî ese ran wergerîne. Eger em Kurdên Kurdistanê jorîn bîdîn ber çavê xwe dîbê ku çend kes jî wan bîkarîn esernî jî Tîrkî wergerî nî Kurdî. Belam kesên ku bîkarîn mesela jî Înglîzî, Fransîzî, Almanî, Rûsî, İtali eser wergerî nî nî, mîrov nabîne. Yanî pîsporên wergerandîna esernî jî wan zîmanan, ku zîmanên bêjeyî nî sereke ne lî cîhanê, hê jî jî nava me derneketîne.

Dema ku wergerên me yê nî weha bîgîhî nî û xwendoxên me jî gurr bîbîn, hîngê pêwîst e ku eserên bîyanî bê nî wergerandî nî jî xwendoxê Kurdî ra bê nî pêşkêşî kîrîn, bêjeya Kurdî bî wan dewlemend bîbe û bîxemîle.

XEBATA BÊJÊYÎ LÎ DERÊ WELÊT

PIRS : Ev çend sal e ku lî derê welêt xebata bêjeyî, hunerî û çandeyî hî nî bî hî nî pêşta dîçe. Jîbo meşandîna van karan bî awayekî rast, mîrov çawa dîkare têkeve xebateka nû û vê xebata nuhayî nî bî tewîreki başîr bî rê ve bîbe?

BERSÎV : Belê, dî van salên dûwayî nî da lî derê welêt xebata bêjeyî, hunerî û çandeyî tê kîrîn, hî nî bî hî nî jî pêşta dîçe. Ez bawer nakim ku dî vî babetî da pêwîst be ku mîrov têkeve xebateka nû. Lewra ev xebata nuhayî nî bî xwe nû ye û mîrov dîkare bêje ku hê jî despêk e. Bî dîtîna mî nî, dî şuna ku mîrov lî ser têketîna xebateka nû bîfîkîre, mîrov bîfîkîre û bîxebite ku vê xebata iroyî nî gurrtîr bîke, jî xeletî û şaşîyan paqîj bîke, yanî bî awa û tewîreki başîr û têkûztîr bîmeşîne çêtîr e. Ev jî lî ser xîret û hêgî nî û berpîrsîyariya nîvîskar û bêjezan û hunermendan e.

KOVARA "JÎN" DÎ ÇAPÊ DA YE

PIRS : Wek nîvîskarekî Kurdî, we çî xebat daye ber xwe? Gelê hun dîkarî nî lî ser xebata xwe xwendoxên kovara "Roja Nû" ronî bîkîn.

BERSÎV : Pîştê ku ez hatîm Swêd, pîrranîya xebata mî nî heta pa yîza parî nî ser kovara "Jîn" bû. Ev xebat payîza parî nî, yanî pî yîza sala 1983'yan temam bû. Kovara "Jîn" dî salên 1918 - 1919'an da lî stanbolê bî Kurdî û Tîrkî derketîye û bî tipê nî Erebi hatiye çapkîrîn. 25 jîmare derketîye, paşê hatiye gîrtî nî. Mî nî her 25 jîmareyê nî kovarê wergerandî nî tipê nî Latîni û lî cîyê nî pêwîst jî mî nî jêrenot nîvîsîn. Her weha, jîbo nasandîna kovara "Jîn" û nasandîna tevgera azadîxwazîya Kurdistanê ya wê demê mî nî pêşkêşîyekî bî Kurdî nîvîsî û wergerandî zîmanê Tîrkî. Kovara "Jîn" dî dî pînc cildan da jî nû va bê çapkîrîn. Dî her cîldekî da dî pînc jîmareyê nî kovarê, hem wergerandî nî bî tipê nî Latîni hem jî orîjînalê nî bî

tipên erebi dê ci bıgırın- Cildê pêşin nuha dı çapê da ye, ez hêvidar ım ku heta dûwayiya salê derkeve. Lı gora bernama ku mın amade kırıye, herçar cıldên dın ji heta payıza 1986'andê derkevin.

Jı bıl kovara "Jin" rêza meselokên lawıran ji dı destê mın da hebû. Jı vê rêzê heta nuha sê pirtûk derketine. Ew ji " Mir Zoro"

" Gurê Bılûrvan" û "Kêz xatûn"ın. Pirtûka çaran, ku navê wê "Serketına Mışkan"e, nuha dı çapê da ye û payıza hati dê derkeve. Mın pirtûka pêncan a vê rêze ji tamam kır, ev'ê ji dı 1985'da dê bê weşandin. Bı vi awayi ev rêz dibe pênc pirtûk.

Dı bernama xebata mın a hati da, wergerandına kovarên "Kurdistan", "Roji Kurd", "Hetawi Kurd" û disa "Kurdistan" heye. Ez dıxwazım wan kovaran ji wek "Jin"ê ji tipên Erebi wergerinım tipên Latini û jı nûva çap bıkıım. Eger hın şolên ne dı hesab da, neqewi mın û hın alûziyên nediti dernekevin, ez hêvidar ım ku heta sala 1990'i ez'ê van kovaran hemi tamam bıkıım û hemi dê bën weşandin. Xeyn jı van kovaran amadekırına ferhengek ji dı bernama mın da he ye. Bı rasti mın sala 1979'an dest bı wê kırıye. Belam heta nuha xebata lı ser ferhengê gelek gıran meşiyaye. Lewra, jı ber xebata lı ser "Jin"ê û meselokên lawıran, mın nedıkari ez zêde wext jı xebata lı ser ferhengê ra veqetinım. Ez hêvidar ım ku jı despêka sala hati pê va ez'e bıkarım lı ser wê hınek zêdetır bıxebıtım û heta sala 1990'i wê ji tamam bıkıım.

Dı bernama mın da nıvisına çend pirtûkên çirokan û kurteçirokan ji heye. Her weha, xebata lı ser "Diwan"a hozan û birbirê Kurd ê nemır Melayê Cıziri ji beşek jı bernama mın e. Ez dıxwazım ku wê ji, jı tipên Erebi wergerinım tipên Latini û çap bıkıım. Dı salên 1960'an da ez du sal lı ser "Diwan"ê xebıtıbûm û mın ew wergerandıbû tipên Latini, belam mın imkana çapkırına wê nedıtıbû. Dema ku polêsên Tırkan avêtın ser mala mın ew ji dıgel gelek pirtûkên mın û xebatên mın gırtın û bıırın. Bı wi awayi xebata mın a du salan tewş çû. Belam destê dewleta Tırkan nagije Ewrupayê. Ez hêvidar ım ku ez'ê dı pêşedemê da "Diwan'a Melayê Cıziri ku dı bêjeya Kurdi da tu eserek heta nuha negihaye tenga wê, wergerinım tipên Latini û çap bıkıım.

Çawa ku hun dızanın, mın lı Tırkiyê "Memû Zin"a Xaniyê nemır ji çap kırıbû. Ez dıxwazım ku careke dı jı lı ser wê bıxebıtım û jı nû va çap bıkıım. Mın "Şerefname" ji lı Tırkiyê wergerandıbû Tırki û çap kırıbû. Eger ez mecal û fersend bıbinım, ez dıxwazım lı ser wê ji careke dın bıxebıtım û wê wergerinım Kurdi û çap bıkıım. Yek jı daxwazên mın ji amadekırına rêzımaneke Kurdi ye.

ferhengok

Abûri	: Ekonomik	Misêwa	: Sürekli olarak
Afırandın	: Yaratmak	Nasandın	: Tanıtmak
Aha	: İşte(Dikkat çekmek için)	Nasin	: Tanımak
Aya	: Acaba(Soru edatı)	Nuhayin	: Şimdiki, Şimdiki zamana ait olan
Azar	: Eziyet, İşkence	Pevek	: Cümle , Tümce
Babet	: Konu	Peyvik	: Sözcük, Kelime
Bername	: Program	Pêkanin	: 1- Uygulamak 2- Oluşturmak
Bêje	: Edebiyat	Pêkhatın	: Oluşmak
Bêjeyi	: Edebi, Edebiyatla ilgili	Pêşedem	: Gelecek zaman,İstikbal, gelecek
Bêjezan	: Edebiyatçı	Pışaftın	: Assimile etmek
Bıngehok	: Kural, Kaide	Rastibin	: Gerçekçi olan kimse
Bızav	: İhtilal	Rastibini	: Gerçekçilik, Gerçekçi olma
Bilcumle	: Tümüyle, Tamamen	Ravadan	: Göstermek
Birbir	: Düşünür, Filozof	Semed	: Neden, Etmen, Faktör
Bûyer	: Olay	Sererastkırın	: Düzenlemek
Cıvaki	: Sosyal	Serwexti	: Kavrama, Bilinçlenme
Çande	: Kültür	Stawr	: Kısır, Verimsiz
Çandeyi	: Kültürel, Kültürle ilgili	Şano	: Tiyatro
Çırûsk	: Kıvılcım	Şiwe	: Yöntem,metod,üslub
Çıvanok	: Tekerleme	Şol	: Mesele Sorun
Dengbêj	: Ses sanatçısı	Tavıl	: Hemen,çabucak
Dûznıvisar	: Düz yazı	Taybeti	: Özel, özgü
Evandın	: Sevmek	Teng	: Düzey, seviye(sözcükteki "t" ince okunur)
Evin	: Sevgi	Tepel	: Zirve, doruk
Fermanrewa	: Egemen, Hakim	Tevger	: Hareket
Fersend	: Fırsat	Tewır	: Çeşit
Geli	: 1- Uzun ve dar vadi, 2- Hal-ka ait olan,Halka ilişkin (Röportajdaki anlamı budur)	Têdayi	: İçerik
Gewre	: Büyük	Têhn	: Isı, hararet
Hevdem	: Çağdaş	Têhdana xwe	
Hevısandın	: Özendirmek,Teşvik etmek	l1 ser tiştetek:	Bir şeye ısınmak,ona ilgi duyup alışmak, onsuz edememek
Heyi	: Var olan, Mevcut	Têkûz	: Mükemmel, eksiksiz
Hêgin	: Kabiliyetli, Yetenekli	Têwkırın	: Saymak, hesaba katmak, addetmek
Hêgini	: Kabiliyetli olma, Yeteneklilik	Tıştanok	: Bilmece, bulmaca
Hêşani	: Kolaylık	Tore	: Gelenek, görenek,anane
Hêzdan	: Uğraşmak, Uğraş vermek, Güç harcamak	Toreyi	: Geleneksel, geleneklere ilişkin
Hingê	: O zaman	Wech	: Neden,sebeb
Hola vala	: Kısır döngü(Terim olarak)	Welatevin	: Yurtsever
Hozan	: Şair, Şiir yazar kimse	Welatevini	: Yurtseverlik
Huner	: Sanat	Wergeran	: Çeviri,bir dilden başka bir dile çevrilmiş olan kitap ya da yazı vb.
Hunermend	: Sanatçı	Wergerandın	: 1- Devirmek.2- çevirmek, bir dilden başka bir dile çeviri yapmak(Röportajdaki anlamı budur)
İroyin	: Bugünkü, günümüze ait olan	Werger	: Çevirmen,çeviri yapan kimse
Jimare	: Sayı, Adet	Xasma	: Özellikle,bilhassa
Kemilandın	: Geliştirmek, Olgunlaştırmak	Xwendox	: Okuyucu,okumayı alışkanlık haline getirmiş kimse
Kemilın	: Gelişmek, Olgunlaşmak		
Komar	: Cumhuriyet		
Kurdinvis	: Kürtçe yazar kimse		
Kurteçirok	: Kısa öykü, Kısa hikaye		
Lewra	: Çünkü		
Mecal	: Fırsat		
Mefa	: Yarar		
Mefadar	: Yararlanan kimse		
Mefadarbûn	: Yararlanmak		
Mêj	: Eski zaman		
Mikur	: İtiraf		
Mikurhatın			
(L1 xwe)	: İtiraf etmek		
Mırrari	: İnci		

50 SALIYA

Kongra Kurdnasiyê ya Pêşin

TOSINÊ REŞÎT

Şoreşa Oktobrê ya mezin tevi gelê Urîseteyê bîndest usa ji bo kurda azadi ani. Bona pêşveçûna gelên rîzgarbûyi pirseke sereke ji hildana nezani û nexwenditîyê bû. Lema ji pêşyê ser bîngeha ti pên Ermeni sala 1921ê, peyra ji ser himê tipên Latini sala 1929'an elifba kurdi tê sazkirinê. Bî vê elifbayê rojnama "Riya Teze" tê weşandinê, pirtûk çap dibin. Gundê kurda da dibistanên netewî têne vekirinê, zanyar dest bî berevkirina folklorê kurdi dîkin, li hîn bajarên Yekitiya Sovyetê da karê lêgerina dirok, edebiyat, ra bûn-rûniştandina gelê kurd hê geş dibe.

Lê çiqas kar gelek tê kîrinê ji, ewqas li ser lêkolanina tewayî û kûr pîrsên nû pêşta tîn. Lema ji 9'ê meha Tîrmehê sala 1934' a kurdnas û zanayên Sovyet, bo kongra kurdnasiyê ya pêşin Erivanê civiyan.

Xên ji nûnerên Ermenistanê usa ji gelek heval Moskovayê, Lenin gradê, Tîblisê, Bakûyê û Aşxabadê hatin û di kongrêda amade bûn. Kongre, di mala çandî a Erivanê da pêkhat. Çawa rojnamên wê demê dinivsinin, qesra kongrê bî sloganê kurdi, Ermeni û ûrîsi xemilî bû, sîvderê da temaşegeha çanda kurdi vekiribû.

Serokê komara Ermenistanê bî aktîvî tevi kongrê dîbin û kongrê serokê Komitêya Navbeyniya Karker ya Ermenistanê Sergo Martikyan vedike. Ew dibêje weki giyana (ruhê) gelê kurd yê hînantînê (efrandariyê) bî sed salan bîndest bûye. Ev giyana bî saya serê siyasetê Lenin ya netewî li Yekitiya Sovyet iro geş dibe û pêşta diçe. Nûnerên rewşenbîrên kurdan, li kongrê bo rê û dirbên pêşvaçûn û serketinên nû civiya bûn.

Nav serokatîya kongrê da tevi nûnerên hukumeta Ermenistanê Martikyan, Paştuyan, Karinyan usa ji Erebê Şemo, Qanadê Kurdo, Heciyê Cîndî, Ahmedê Mirazî, prof. Panisidî, prof. Çobanzade, Eli Mamedov û yê mayin tîn bijartinê.

Bî navê komîteya navbendî ya parti komunist ya Ermenistanê serokê para çand û propagandayê Arisyan, kongrê sîlav dike û gotara bî sernivîsa "Şoreşa Oktobrê û pêşvaçûyîna çanda netewî nava karker û gundiyên kurda" dîxwine.

Asistanê seksiyona kurdi ya Enstituta Diroka Çandî Heciyê Cîndî bî zîmanê kurdi derheqa karê seksiyonê di warê berevkirina folklorê, pêkanîna peyvên nû û karên çapkirinê da diaxîfe. Berpirsiyarê rojnama "Riya Teze" Cerdoyê Genco, derheqa rojnamê da gîlî dike û dibêje, weki "Riya Teze" bûye dostekî baş bo xebatkarên . Derheqa çapkirina edebiyata kurdi da Casîmê Celîl pêşta tê, Ew di de kîvê, weki sal bî sal hejmara pirtûkên kurdi yê çapbûyî zêde dibe. Çawa tê zanin sala 1929'an da du(2) pirtûkên kurdi çap dibin, sala 1933'an da pistudu(22) pirtûk tîn çapkirin, lê nava 6 mehên sala 1934'an da 25 pirtûkên kurdi di gîhêjin destên xwendevanan. Siloyê Xudo ji navça Ertîkê, derheqa lêzêkirina berevkirina folklorê kurdi da diaxîfe. Ew di gotara xwe da dibêje ku, pêwîste zîmanê rojnama "Riya Teze" ji bê zelalkirin. Nivîskar Ahmedê Mirazî ji navê kurdê komara Gurcîstanê pêşda tê û derheqa destanîyê xebatkarên kurd da gîlî dike. Ew usa ji derheqa berevkirin û çapkirina folklorê kurda ya sazbandîyê da diaxîfe û gerek em bî tay-

beti l1 ser vê pîrsê bisekînin, nîmûnên paqîj û b1 rengêki netewî bîjbêrîn dîbêje. J1 Azerbeycanê Şaxsuvarov derheqa pêşvaçûyîna d1 bîstanen kurdi da dîpeyive.

J1 navê Komîta Elîfba nû Erebê Şemo dîpeyive. Ew nava gotara xwe da l1 ser Rêzîmana Zîmanê Kurdi (ya prof. Xaçaturyan amade kîrîye) dîsekîne û kêmasiyên wê tine ber çavan. Dîsa ew usa dîde kîvşê ku, hînek pîrtûkên çap dîbîn, pîr sistîn û d1 warê edebî da gelek paşda mane. Eminê Evdal derheqa edebiyata zarokan da dîpeyî ve.

Paşê sîlavname tîn xwendînê: Nav wana da nûnerê komara Turkmenistanê Veliev, serokê para çandî û propagandayê ser navê Komîta Pîştakavkazyayê Partiya Komunist Bediya, dewsgirtiyê prezîdentê filyala pîştakavkazyayê Akademiya Yekitiya Sovyetêye Zanyarê Pîzumyan, berpîrsiyarê rojnama "Zarya Vostoka" Grigoryan û yêd mayîn.

Prof. Açaryan û prof. Xapansyan derheqa, pêkanîna yekitiya zîmanê kurdi yê edebî da dîaxîfîn.

Qanadê Kurdo derheqa bîngeha rêzîmana kurdi da dîpeyive, pey gotara wî prof. Manandyan, prof. Kalantar, Vilçevski, Rostapçîn, Çerkezê Beko l1 ser vê pîrsê baweriyên (dîtinên) xwe diyarî hevdu dîkîn.

L1 sîlavname Komîteya Navbeynîya Partiya Komunistaya Yekitiya Sovyetê da, taybetî l1 ser pêştaçûyîna kurdên Sovyetê tê sekinandin. Tenê l1 komara Pîştakavkazê 1933-34'an da 56 pîrtûkên kurdi çap bûne. 88 dîbîstanên kurdi kar dîkîn. L1 Erivanê rojnama "Riya Teze" çap dîbe, xwendînxana Pîştakavkazê kurdi kar dîke û j1 bo d1 bîstanên kurdi kadroyan amade dîke.

14'e Tîrmehê kongra kurdnasiyê karê xwe ser hevda anî. L1 ser 4 pîrsên serekê hat sekinandin:

- 1- Sazkîrîna zîmanê kurdi yê edebî.
- 2- Rastnîvisar û elîfba kurdi.
- 3- Rêzîmana kurdi.
- 4- Çêkîrîna peyvên nû.

Bîryara kongrê da, d1 warê bîngeha zîmanê edebî da, zîmanê kur dîn Ermenistanê hat naskîrîn. Derheqa sazkîrîna merkeza kurdnasiyê û spartîna komîta elîfba nû da bîryar hate girtîn. Dîsa bîryar hat girtîn ku, kongra kurdnasiyê ya duwemîn sala 1935'an da l1 ba jarê Bakuyê derbazkîn, l1 Unîversîta Erivanê kursîya kurdnasiyê vekîn, bo berevkîrîna folklorîna kurdi lezkîn.

L1 kongrê, j1 bo pêkanîna rêzîmana kurdi zanyarî û bo rêzîmana dîbîstanan komek tê hîlbîjartîn, Nava vê komê da Xaçaturyan, Erebê Şemo, Vilçevski, Qanatê Kurdo, Pehlevî, Heciyê Cîndî û Sûker - man cih dîgrîn.

Kongrê xebatek bo zaningeha Moskoyayê û Lenîngradê pêwîst dît; wekî lêkolînek fireh û lez l1 ser dîroka gelê kurd bê çêkîrîn û nîvîstokên dîroka gelê kurd bîn çapkîrîn.

Îro d1 ser kongra kurdnasiyê ya pêşîn ra 50 sal derbaz bûne. P1 raniya bîryarên vê kongrê b1 rûsîpîtî hatîne pêkanînê. Kurdnasê, Sovyet L1 Moskoyayê, Lenîngradê, Erivanê, Tîblîsê, Taşkentê û bajarên mayîn b1 serfîrazî b1 pîrsên dîrok, edebiyat û çanda kurdi va mijûl dîbîn.

Îro kurdnasiya Sovyetê gihîştîye merhaleke bîlînd û destanîne, wê j1 dervayê sinorên welatê ma j1 tîn naskîrînê.

Himdarê Nivisandina Romanên Kurdi

EREB ŞAMILOV

Çawa tê zanin Ereb Şamilov 5 sal berê çû dîlovaniya xwe. Ev lêgerina jî bo biranina "BAVÊ ROMANÊN KURDI" hatiye amadekirin.

ROHAT

Nivîskar, zîmanzan û himdarê nivisandina romanên kurdi Ereb Şamilov, di sala 1897'an da jî diya xwe bûye. Ew li hêla bajarê Qerîsê, li nehiya Susûzê hatiye dinê. Ew, zaroktiya xwe li wir derbaz dîke. Zaroktiya wî jî, wek gelek zarokên kurd, di nav belengazi, xîzani û hejarîke mezûn da dibuhure. Jî alîki da kar dîke û jî aliyê din da ew diçe dibîstanê. Ew şivani, berxvanîyê dîke û paşê li ser rîya hesin dibe karker.

Di nav van salan da Ereb Şamilov, jî alîki da xwe davêje nav a girê şoreşa Oktobrê û bi dîzikava nav karkeran da dimîne, wan hişyar dîke û bi wan va dibe yek. Jî ber van karên xwe, ew di sala 1918'an da dibe endamê Partiya Komînist Lî Sôvyetistanê û li hemberî kesên diji şoreşê, bi wan ra şer dîke. Bi vî tehrî ew jî bo serketina şoreşê dibe camêreki bawermend, zîrek û dil bi şewat.

Ereb Şamilov gelek salan li Ermenistanê û Gurcistanê dimîne. Ew jî bo ortêhîlanina nezaniyê, bir-baweriyên feodal û jî bo pêşketina şoreşê di nav kurdan da kar dîke û şev-rojên xwe di vê rê da dibuhurine. Bi kurtî, ew di vê rê da dibe peya, nefer û xêrxwazeki bawermend.

Pîşpor, zane û nivîskarê navdar Ereb Şamilov paşî qedandina xwendina bîlind, ew, di nav salên 1931-1937'an da, li Leningradê dersên zîmanê kurdi dîde. Li ber destê wî gelek şagirt, xwendekar û pêşekzanên jêhati xwe digihin.

Paşê di nav salên dûr û dirêj da, jî ber karên wî hukmeta Sovyet xelatên bi navê "ALA SOR" û "DOSTIYA GELAN" diyari vî lawê kurd dîke.

Şamilov, di sala 1978'an da, jî me veqetîya û çû dîlovaniya xwe. Mîrîna wî bû dîlopeke ava sar, li ser dilê bî hezaran xwendevanên wî reşîya.

Ereb Şamilov, xên jî karên li ser zîman, dirok, sosyoloji û çanda kurdi, jî me ra 4 romanên jî hev xweştîr hişt. Ev romanên iro sêrtaça edebîya me tînen hesabandin. Di vî nivîsara xwe da, emê li ser van romanên Ereb Şamilov bîsekînan û emê "Bavê Romanên kurdi" jî xwendevanan ra bîdan naskirin.

* * *

Jî ber çî Ereb Şamilov himdar û bavê romanên kurdiye? Jî ber ku heta nîveke sedsaliya 20'an, bî destê nivîskareki kurd û bî kurdi romaneke edebî nehatîbû nivisandin. Ev yeka valahîke berbîçav bû, di nav edebîyata me da. Şamilov ev rê vekir û paşê di vî rê da çend peyketyên wî gihiştin. Bi vî tehrî, nivisandina romanên kurdi, di nav edebîyata kurdi bû, şop û rêçeke nûvekirî. Paşê çend romanên hêja, jî aliyê nivîskarên kurdan da hatin nivisandin wek Heciyê Candi(1). Eliyê Evdîlrehman(2) û Sehidê Ibo(3), van nivîskaran efrandinên nû raberî xwendevanên xwe kirin.

Peyvoka "roman" ji zımanê frensi hatiye û paşê ketiye nav gelek zımanên cihanê. Roman çiye? Roman bî firehi û bî kûrayî nivîsandina hîn bûyerên bî hevra girêdayî, dî nav demekê da, serpêhatiya van bûyeran raberi me dîke. Ji ber vê yekê ji, nivîsandina romanên edebî karekî hunerî torevaniye.

Hejmara romanên kurdi pîr kêman. Ev kara ji, iro ber niviskarên kurdan sekîniye. Dema em lê dînhêrin, hîn niviskarên biyani, lî ser kurdan, ji kurdan zêtîr roman nivîsîne, wek niviskarê Elman Karl May(4), niviskarê Înglîz James Aldridge(5), niviskarê Ezerî M.S. Ordubadi(6) û niviskarê Tirk Omer Polat(7). Dî hejmareke kovara "Roja Nû" da lî ser vê pîrsê hatibû seknandin(8).

Carîna ji, hîn niviskarên kurd, ne bî zımanê kurdi, bî hîn zımanên biyani va ceribandîne û bî van zımanan va efrandinên xwe nivîsîne, wek Sadîk Cûbek- bî Farîsî(9), Mahmut Bakî-bî Tirkî (10) û Bavê Nazê- bî Erebi, paşê bî Rûsî(11). Nivîsandina van romanan bî zımanê biyani, ji ber tûjbûn û giraniya zordestiyên politikî. Hêzên kolonyalist ne tenê roman, bî nivîsandina zımanê kurdi va her tîşt lî Kurdîstanê qedexekirîne.

Ereb Şamilov, bî romanên xwe va panorameke fireh lî ser kurdan dî rojên bihuri da, lî ber me radixe. Her romaneke wî da, du pencere hene. Ji pencerekê da pencên rojên reş, rojên tîrş - tal û pencên rojên hejariyê xuya dibîn. Ji pencera din da ji, tirêjên, rojên serbestiyê, dilşahiye û tîrejên rojên felatê dîçûrusîn, dibîrîqîn. Ev dubendî(tezat) dî romanên wî da pîr xurtîn. Rewşa Kurdistanê, dî çarçeva politik, aborî û civakî da, lî her romaneke Êreb Şamilov da pîr ronî û zelal ji me ra xuya dibe. Bî kurtî her romaneke wî neynikeke, mirov têda xwe dîghîne kûraya sedsalan. Ji aliyê din da, dî warê folklor, çand, dirok û zımanê kurdi da, her romaneke Şamilov bî serê xwe defineke hînbûn û zanîneye.

Romana pêşîn "ŞIVANÊ KURD" dî sala 1935'an da lî Erivanê çapbû. Paşê wek çapên rûsî û gurcî derketîn. Dî sala 1978'an da ji, lî Îstebolê bî zımanên kûrdî-tirkî, du zımanan va hat çapkîrîn(12).

Ev romana, ji hersê romanên din, ji alikî da cuda dibe, ji ber ku, dî vê romanê da serpêhatiya jiyîna niviskar bî xwe naveroka romanê bî firehî pêk aniye. Romana Şivanê Kurd her çiqas ji, lî ser jiyîna niviskar bibe ji, lê disa ji folklorê kurdan, deb-aborîya kurdên wê demê, rewşa politik lî navçê, bî rastî niviskar bî navê xwe, serpêhatiya gelê kurd dî romanê da xwestiye nişan bide û gihîştîye serfiraziyê ji. Serpêhatiya mîrxasê romanê û rewşa kurdan dî romanê da, mirov ji hev nîkare bide cudakîrîn.

Romana Şivanê Kurd dî sala 1959'an da ji lî Erivanê bî navê "BERBANG" carke din çap dibe. Berî mîrîna Êreb Şemo, ev romana bî romanên "Jiyîna Bextewar" û "Hopo" va, dî nav berevokeka mezîna da cih digrîn û ji nû va çap dibe(13).

Dî nav herçar romanên Êreb Şamilov da, romana "DİMDİM" ciheki bî taybetî digre. Ji ber ku, ew dewra bûyerên romanê têda derbaz dibîn, angorî romanên din, pîr kevne û ev roman bî rastî ji, romaneke dirokiye. Çawa tê zanîn, hîn rûpelên diroka Kurdîstanê hên baş nayên zanîn, ji ber ronîkirîna van dewrên tarî, ev romaneke pîr kêrhatiyê.

Çawa tê zanîn paşî şerê Çaldîran, Kurdîstan dî navbera Împaratoriya Osmanî û Farîsî da dibe du beşan. Bî girêdana peymanê Qasrî-Şîrîn(1639) va erdê Kurdîstanê vê carê bî resmî tê zevtkîrîn. Dî navê wê rewşa dijwar û çetin da zordestiyên lî ser gelê Kurd hîn ji zêtîr dibîn. Lî hemberî wê zordestiyê gelê Kurd bêdeng namîne û serê xwe hiltîne. Bî pêşengîya xanê Lepzêrin(Carîna dibê-

jîn Xanê dest an ji çepzêrin) vê carê li dîji ordiyên Şah Abbas 2'an, gelê kurd dest bi şer dîke. Mêrxasê romanê, di romana "DIM-DIM" da Xanê Lepzêrine, ew kurdan dora xwe berev dîke, ew paşê pîr xurt dibe. Bi pêşengiya Xanê Lepzêrin gelê kurd li dora kela Dîmdîmê(Li Kurdistanê Iran) bi mêrani ber xwe dide. Ordiyên kurdan pîr caran zora farîsan dibîn.

Lê ordiyên Farîsan bi xayîni rê û ava kela Dîmdîmê dibîrin, kurdên ku kelê da dimînin, bi mehan ti - birçî berxwe didin. Paşê, ji ber ku nekevî destê dijmin, hemû mêr-jîn, kal- pîr xwe darda dikin, dişewitînin û xwe nadin destê dijmin. Dema ordiyên Farîsan dikevî nav kelê, cendekê keç-bûkên xwedardakirî, cendekê di navêgir da şewîti-kızîrî, ew dibînin, bi rasti tu kesekî zêndî namîne. Ordiyên Farîs vê carê destvala, pîr-poşman vedigerî mala xwe. Lê serokê ordiyên Farîs bersivê, ji şah Abbas ra û dibêje: " Mîn hemû kurd kuştin, qirkirin, ji wana tu kesek nehişt". Ew bi vi tehrî raste-rast derewan dîke.

Ev romana mêrxasîyê, berxwedan û azadîyê, di nav edebiyata Kurdî da, ciheki hêja digre(14). Di sala 1984'an da ji, ev roman li Swêd di nav weşanên "Roja Nû" da çap bû.

Bi nîvisandîna romana "Dîmdîm" va Erebb Şamilov gaveke hîn ji fireh û pêt avêtiye. Hevgerêdana bûyeran, hîlbijartîna mêrxasan, danaskirînen(Tasfîr) xurt, bi taybetî danaskirîna kela Dîmdîmê, dem û dezgên wê, jiyîna hundîrê wê, ji aliyê nîviskar da bi jêhatî hatiye pêkanî. Bi kurtî nîvisandîna vê romanê va Erebb Şamilov pîr pêşketîyê û gîhiştîyê serfirazîke mezin.

Romana sêwemîn " Jiyîna bextewar", Erebb Şamilov çawa di pêşgotîna wê da ji diyar dîke, weki wi ev romana, paşî xebateke dûr û dirêj di nav çar salan da qedandîyê(15).

Di vê romanê da serpêhatiya kurdên koçer-rêwî cih girtîyê. Ji ber zordestîyên giran hîn kurdan, li Tirkîyê(Romê) çawa erdê kalbavên xwe hiştîne, derketîne serê rê-dîrban û ber bi Ūrîsetê herî kîne, romanê da serpêhatiya van kurdan heye. Paşê van kurdana, di nav Şoreşa Oktobêrê, di nav jiyîna sosyalîst û berxwedana gelên sovyet li dîji êrişkarên Hitler da çawa cih girtîne, hemû ev periyodana bi hevra hatîne gîredan û naveroka romanê pêk anîne.

Di romanê da zordestî-serbestî, neheqî-wekhevi, belengazî-dîlşahi, bi kurtî hemû tehrên jiyîne yê baş û nebaş du hev rêz bûne.

Romana dawîn "HOPO" ji tenê romana rojên qenc, rojên xweş û romana rojên dîlşaye(16). Ji ber ku, hemû bûyerên vê romanê, ji hemû tehrên zordestîyên dûr, di bin baskê sazumanêke sosyalîst da derbaz dibe. Despêkirîna jiyîneke nû, jiyîna bi hevra, di nav kolxozan da, guhastîna mirovan, ketîna maşînan li nav kurdan, şkandî na bir-bawerîyên pûç-vala, pêştîçûyîna dostîyê û ji şabûnê firîna mirovên dîlşa, di vê romanê da, di nav hevda cih girtîne.

Hêjabûna van herçar romanên ji ku tê? Bêşik û bê guman, eva ye ka bi pîsporiya nîviskarê romanên va girêdayîye..

Erebb Şamilov bi dirêjahîya salan, ji alîki da li Kurdistanê ma ye, kurd baş naskirîne, derd-êş û psikolojiya(rûhiyet) wan rind jê derxistîyê. Di nav merc-hoyên kolonyalist da jana gelê kurd bi çavên xwe va dîtîyê. Ji aliyê dîn, wi welateki sosyalîst da ji, jiyîna xwe ajotîyê. Di navbera du cihan û du sistemên cuda Erebb Şemmo gelek salên xwe derbazkirîyê. Vê yekê pîr tecrûbe gihandîna wî Ji aliyê dîn, zanebûna pîr zîmanan ji, deriyên nû li pêşîya nîviskarê bi nav û deng vekirîyê. Xên ji zîmanê Kurdî, Tirkî, Rûsî, Ermenî haya wi ji gelek zîmanên mayîn ji hebû.

Ereb Şamilov zane û ronakbireki pır hışyar bû, lı cihanê, lı navçê û lı Kurdistanê çı diqewêmi, wi roj bı roj ev yekana berçav dıkirin. Bı kurti Erebb Şamilov xudanê felsefeke kûr bû. Bı rasti hêjabûna romanên wi, bı şaxsiyeta wi va pır girêdayine. Jı hevderanina (analiz) bûyeran, nêzıkihevkirına (sentez) tıştan û lı hemberıhevkirına (contration) bûyeran da ew xudanê cerıbandınên bı sa lan bû.

Wi dostaneti û dijminatıya navbera gelên navçê, baş jı hev deraniye. Gelê kurd û bı taybeti ordiya belengazan pêwıste piştaxwe bispêre kıjan hêzan û kıjan hêzan bıde pêşberi xwe, wi ev pır sa dı romanên xwe da baş nıtırandıye. Wek van pırsan, gelek pırsên dın jı guhdariya nıvıskar pır kışandıye ser xwe.

Hımdar û bavê romanên kurdi iro dı nav me da tûneye, lê iro romanên wi lı ser destê bı hezaran kesan da dıgerın û navê wi dı keriki dilê gelê kurd da ciheki germtır gırtıye. Paşı mırına wi, salekê şûnda hevalê wi, Heciyê Cındi vê yekê xweş diyar dıke û dı bêje: " Lê efrandinên wi mane nemrı û bı wana va girêdayi, navê wi yê hezkıri wê hertım dı dilê me da bımıne"(17).

Ereb Şamilov ne tenê lı Yekitiya Sovyetan û wusan jı lı gelek welatên cihanê iro navê wi tê zanın. Dema ew çû dılovaniya xwe, dengê mırına wi, zû dı nav gel da belav bû, gelek rojname û kovaran ser wi nıvisin.

Dılşewatiya Erebb Şamilov lı ser Kurdistanê azad, demokratik û sosyalist pır xurt bû. Ew hertım çavnêri, bendewar û hêviya van rojên dılşa maye. Ew vê dılşewatiya xwe dı rasthatıneke xwe da xweş diyar dıke! Apê Erebb em heta ber deri rê kırin. Bı dılgıranı sılav lı me kıır. Beri ku dergêh lı me bıgre, dısa got: Jı Kurdên Romê ra sılavên mın bêje, mêrên çê bın, çê bıxêbitın, mılletê xwe jı koletiyê xelas bıkın"(18).

ÇAVKANİYÊN KERHATÎ

- (1)- Hewari- Heciyê Cındi, 1967- Erivan
- (2)- Xatê xanım- 1959, Dê- 1965, Gundê Mêrxasa- 1968 Eliyê Ev dılrehman, Erivan
- (3)- Kurdên Rêwi- Sehidê İbo, 1981, Erivan
- (4)- Durchs Wilde Kurdistan- Karl Max, 1892, Bamberg
- (5)- Mockery in Arms- James Aldridge, 1974, London
- (6)- Dumanlı Tebriz- M.S. Ordubati, Tebriz
- (7)- Mahmudo ile Hazel, 1973, Saragöl, 1974, Dilan, 1976, Ömer Polat, İstanbul
- (8)- Pırsa Kurdan dı nav Edebiyata Tırkan da "kovara Roja Nû" 1-1983, Stockholm, Rohat
- (9)- Mêrê Madam Ahûyê- Sadık Cûbek, İnan
- (10)- Mezra Botan, Mahmut Baksi, 1968, Tırkiye, Hêlin, Mahmut Baksi, 1984, Swêd (bı Swêdi û Kurdi)
- (11)- Çiyayên bı xwin- Bavê Nazê 1981, Moskova
- (12)- Şıvanê Kurd- Kürtt Çobanı, Erebb Şamilov (bı zımanê Kurdi û Tırki bı hevra) 1978, İstanbul
- (13)- Berevok, Erebb Şamilov, 1969, Erivan
- (14)- Dımdım, Erebb Şamilov, 1966, Erivan
- (15)- Jiyina Bextewar, Erebb Şamilov (Berevok Rûpel 151-384) 1969, Erivan
- (16)- Hopo, Erebb Şamilov (Berevok rûpel 384-571), 1969, Erivan
- (17)- Emekdarê Bedewnıvisarê me, Heciyê Cındi Rojname " Riya Teze", 1979, Erivan
- (18)- Mırına Erebb Şemo, Kendal, Kovara Azadi, 1978, Paris

Mêrxasek

DI DILÊ GEL DA

Bûyera 38'an dî dilê xelkê Dersimê da birinek here mezin û kûr e. Gelê me ên ku humber dijmin rawestane û bî mêrxasi şer kirine û hatine kuştin wan tu car jî bir nake. Nav û camêriyên wan tîm û tîm lî ser zarên hemû nivşanin nivşe, ber bî ber her dimeşin û dî jin. Çî jin çî mêr, çî xort çî kal bîn, pê bawerim ku gişt navê Alişêr û Zarifê dızanin û bî navê wan serbîlind û kubar dîbin. Ev çiroka tişteke ne xiyali ye; bûyerek berçave û jiyana gelê me da derbas bûye. Nişani me dîde ku gel her qedîrzanin, xebatkarên aza dî û rîzgariyê jî bir nakin û jinek dûr û dirêj bo wan pêk tinin. Carna jinek usa rengin bo wan çêdikin tu dibêji ka ev ne ye marov ew ye qehremanek xiyaliye. Lê belê gel mêrxasên xwe li gor dîkî û dîxwazên xwe dixemilînin.

Dema ku min navê Alişêr û Zarifê bihist zarok bûm, hin destê bî dibistana ewlin nekiribû. Ku mêvan dîhatin an ciran dî odê da kom dibûn, bo me jî kar derdiket. Yekî avek bixwasta an seba qelûn û cixarek, agir pêwîst bûbûya em dî paş deri da amade bûn û çavên me her tîm lî ser wan bûn. Carna dilê me teng dibû, me dixwast ku biçin der û bêhna xwe derxin; lî gor kêfa xwe bigerin û bileyizin. Lê carna jî gotubêja mezina pîr germ û şirin dibû, qala mîrov û meselên berê dîkîrin û dî rêveva peyivîne da mîrov xwe wînda dîkîr û ha xayîz dibû. Te dîgo evana jî 38'an bêtir tişteke nîzanin. Devê wan bî 38'an vedibû û qala biranînê tertelê Dersimê dîkîrin. Dijmin çawa bî ser da çûye, çî qetliam hatine kirin û çawa xwîn rijandine, eşîr çawa bî hev ketine, kijan dîlsoz û welatparêz bûn kijan kes û eşîran bêbextî û namerdi kirine... Keser dîkişandin, kelegîrî dibûn û yek bî yek qîsedîkîrin. Bî vî awayî wext derbas dîkîrin. Giraniya behs lî ser diroka xwînî bû, te dîdit yekî destên xwe dirêjî ezman dîkîr û dîgot: Xwedêo, wan rojan careke dîn nişani zar û zêçê me nedi.

Em bî van çiroka va mezin bûn. Himên raman û hestên welatparêziya me bî van va hate avêtin. Serboriya Alişêr û Hevalê yek jî wane û dî nav da çend sal derbas bûne, disa jî wek iro lî bira mî ne. Tiştên ku dî vî wari da min bihistine ne jî devê kesekine û ne tenê dema zaroktiyê da hatine guhdar kirin, heya çend sal berê jî çendî car jî kal û pîra xasîma ên ku jî tertelê 38'an xilas bûne û Alişêrê rametî dînasîn pîrsiye û bihistiye.

Alişêr, jî Qoçgiriye hatibû Dersimê. Ew û Seyid Rîza dost bûn û pêş da hevudu naskiribûn. Dewleta Tırka derheqa Alişêr da fermana êdamê derxistibû û lê digeriya. Jî ber vê sedemê wi Qoçgiri cihîşt û hate Dersimê û lî wir ciwarbû. Bî tenê ninbû, jîna wi Zarife û çend çekdaren din jî lî gel bûn, Dewletê çend car ew jî se yid Rîza xwest, lê wi neda wan.

Mîrovê wek Seyid Rîza qemiş nedîkîr ku navê wi bigire ser zîman û bêje "Alişêr" jê ra dîgot "Mîr", "Mîrê min", "Alişêr Efen - di". Qedrê wi pîr bîlîndbû, xelkê rûmeteke mezin nişan dîda, ku biçûya destmêjê an jî derva bahata hundur pêş hemiya Seyid Rîza qiyam dîkîr û radibû ser piya û tîm lî jorî xwe da dîda rûniştin.

Alişêr mîroveki gelek zana bû. Wek golek bê bîn bû; heft qat ser erd û heft qat bîn erd dîzanibû. Lê ne qure û pozbîlînd bû.

Ha zarokek biçûya cem bî rûgermi hal û xatirê wi dipirsi, guh dîda û pê şa dibû. Mirovek nûrani û dîlnizm bû. Ew ku cîvin û civatekê da beşdar dibû, giraniyeke mezin li ser mîlet da dihate û dewê kesi venedibû. Dîxwestin ku ew biaxîfe ên dîn ji guh bîdîn û ji raman û gotinên Mir dersbigirîn. Lê, ew ji piçek dipeyivî û qî se davitîn pêşiya cîmaetê û rê dîda gotubêjekê şîrin û germ. Pîrsek an meseleyek dihate pêş Seyid Rîza dereqep li Alişer. dînhêri û fikrê wi dipirsi: serincek mezin dîda gotîna Alişer û paşê biryara xwe nişan dîkîr. Bona vê yekê her kesi dîgo "Mir aqıldanê se yid Rîza ye".

Alişer Efendi pîr xwendibû û hin ji şev û roj li kitêban mêze dîkîr. Kitêbeke wi hebû çend sal paşê wê çî bibûya têda nivîsi bû. Çend sal berê Mir gotibû, "Mîstefa kemal wê serme da bê û qestê Dersimê bike. Dîvê em hazîriya xwe bîkîn. Dîjminatîyê ji na eşîra rakîn û dest bî hev dîn".

Alişer Efendi şairek bî nav û deng bû. Helbestên wi dî cîvata axa û bega da dihate gotîn. Wi bî xwe ji carna tembûr dîgirt destê xwe û dîgot

Yê me ne mirîne kîbrîd û are
Dê werîn sêrkîn va çî exsîrhale.

....."

Stranên ku Alişer nivîsîne ji bir çûne. Car car çend kêşeyên wan tîn bîra kal û pîra wek ên jorê. Pîraniya wan helbesta li ser serhîldana Qoçgîriyê û derheqa Dersimê da hatîne nivîsin. Şahan sazêk xweş lê dîda û beytên Alişer dîstrandîn. Alişerê rehmetî dîgo: "Têla ku Şahan digre ez nîkarîm, gotîna mîn ji ew nîkare...Lê, ya ku pîr dihate gotîn "Kîlama Dersimê" bû.

Alişer û Zarîfe gelek ji hev hîzdîkîrîn. Herdu xîzmê hev û ji eşîra Şîxeseni bûn. Wana tu car navê hevudu nedîani ser zar, Alişer dîgo "Hevala mîn", wê ji gazîdîkîr "Hevalê mîn". Dîldarî û pêwendîyên wan ji gîşka ra nîmûne bûn. Qedrê hev dîzanîbûn û ji hev dîr nedîman. Ji xwe Zarîfe ji ne tenê jîna malê bû. Wê ji rext û pûsatên xwe girêdîdan û tîfîng mîlê xwe va dîkîr û dî nav eşîra da dîgerîya. Pîrsên sext û dîjwar ku navbera eşîra da peyda dibûn Mir û Seyid Rîza tîka ji hevalê dîkîrîn ku here û çareser bike.

Heval Zarîfe, jîneke jîr û jêhati, bejnîbala û hestîstûr bû. Mîrov qemişê wê nedîkîr lê bînhêre... Li gel jînen serok eşîra û ên dîn pêwendî û dostîyeke germ çêkîrîbûn; dî nav wê û hîneka da xwengî (xwuşkati) nebû, Karê her camêri nînbû hîmber hevalê qîse bike an cîvata wê da beşdarbe. Bî rastî jînek baqîl û çeleng bû. Ku behsa wê dîkîrîn, dîgotîn "Xanîmê ha gotîbû" an "Çawa ku Xanîm dibêje..." Çî mîxabin jînek bê zaro bû û qet ducan nemabû.

Tertelê Dersimê wek hezaran ev du mîrxasê me ji xwînê da gevîzandîn. Lê ew bî destê dîjminên derva ne hatîn kuştîn, dîjminên hundur ew xwarîn. "Rêberê" xayîn qestê canê wan kîr û serê wan ji bîri, bîr Evdîla Paşayê Tîrka ra. Rêber, bîrazîyê Seyid Rîza bû û navbera wî û mamê wî nexweş bîbû. Wî hember apê xwe dawa serokatiyê dîkîr. Dewletê ji vê dîjberîyê îstîfade kîr û ew kîşand alîyê xwe û berda nav eşîra û pêsiira Seyid Rîza. Êdî rêber bû sîxur û a janê Dewleta Tîrk û wek gurek har kete dû welatparêza û şervanên me.

Rojekê Alişer û xanîmê dî şkeftê da rûniştîbûn. Alişer Efendi hazîriya xwe kîrîbû ku here Yekîtiya Sovjet û bo serhîldana Dersimê arîkari û piştgîriya wan bîxwaze. Rêber, heyvek berê xwe rexne kîrîbû, şaşî û xeletîyên xwe qebûl kîrîbûn. Seba vê yekê ew ji bî mîrovên xwe va hatîbû nav şorîşvanan û pêşberî leşkerê Tîrk. Şer dîkîr. Lê, ev dek û dolavên dîjmin bûn û dîxwestîn ku nav cepê da

Hevalê hesabê xwe çêkırîbû. Mecal nemabû. Ewê bî destê rêberê xayin va bihata kuştin, qene heyfa heval bigirta û paşê bihata kuştin.. Lê usa jî kîr. Zarîfê piştê xwe da diwarê şkeftê û mêvânên bêbext girtin bin çav û tetik da sekîniya. Alişêr jî xwînsariya xwe wunda nekîr, Seba çekîrîna xwarîna wan xebitî. Pîr nekîşand, tornê Mistê Surê Piştê va gulle berdan Alişêr Efendi!.. Qorîni bî Alişêr ket û got: "Rêberê xayin!.." Lî hevala xwe nihêrî û kete erdê. Jî xwe heval lî ser tetik bû û şaş nekîr. Şeşara xwe dirêjî rêber kîr got: " Hevalê mîn!..Heyfa te jî tu kesî ra nahêlîm!..". Deng bî şeşarê ket. Tornê Mistê Surê ber gullan ketîbû... Rêber jî ber şeşara hevalê xîlas bûbû û tenîştê va gulle berdabû Zarîfê.

Rêberê zalîm û xwînxwar, Alişêr Efendi û Zarîfê bî vî awayî şehîd kîrin û serê wan birin û birin Evdîla Paşayê celad ra. Meytên herdu delala bî xwîna sor û zelal va dî ci da hiştin.

Xeberên bêxêr zû belav dibîn. Seyîd Rîza ku pêhesiya Mir û heval hatîne kuştin xwe gorî cîmaetê û deng da: "Mîro, Mirê mîn". Xwezi ez pêşî te bihatîma kuştin. Te mîrîna mîn bihistîba!". Êdî xêr dî cepê kurdîniyê da nemabû, xayin û bêbexta wek cara kîrî-nên xwe disa kîrîbûn.

Kê ku ev xebara bihist berê xwe dan şkefta xwînin û ziyaret kîrin. Gîşka bî çavên xwe ditîbûn: Herdû nermê (meyt) gîhiştîne ba hev û dest dane hev. Birîna stuyên wan xwe bî xwe xweş bûye û qasî kartek maye. Lê xwîna wan mêrxasa hin hîşk nebûye. Disa hemûya bî guhên xwe va bihistîbûn: Nermeyê Alişêr Efendi ga zidîkîr, "Hevala mîn!", Zarîfê bersiv dîda "Hevalê mîn!".

Rêberê xayin ku serê Alişêr û Hevalê bîr Xarpiîtê û pêşkêşî Evdîla Paşa kîr, disa vegeyîra hat Dersîmê. Çend roj paşê fermande leşkerê xwînxwar gazî kîr, xwast qîşla destê. Rêber lî hespê xwe yê keyêl suwar bû û kurê xwe yê yanzdeh salî Ali Heyder jî girt cem xwe bî hevra çûn baregayê leşkerî.

Albay, ew da rûniştin û pîr dîr û dirêj nekîr go " Rêber karê me û te êdî xîlas bû. Dîxwazîm çend tîştê jî te ra bêjîm û dawîya dostiya me binîm". Rêber pêşwaziyet evto texmîn nekîrîbû, şaş mat ma û çena wî venebû ka çî bêje... Fermande axaftîna xwe domand. " Mîrovên ku jî neslê xwe ra dijîmîntiyê dîkîn, tu kesî ra yar nabîn! ". Albay şeşara xwe berda eniya rêber û bî destê xwe kuşt. Ali Heyderê bêguneh jî kuştin, dar û kevîr bî ser da anîn. Belê divê ev bûyera jî bo xîyanetkarên welat û mîlet bibe dersek mezin.

Panzdeh sal berê lî Xarpiîtê mamoste bûm. Doğan Öz'ê rametî jî lî wîr sawcîtî dîkîr. Em dost û heval bûn. Rojekê mîn ev serborîya jê ra neqîl kîr. Pîr xemgîn bû û çav tîjî kîrin û peyivî: "Be lî ew nemîrîne û namîrîn". Jî ser vê gotubêja me demek kurt derbas bûbû ku keçîkek Doğan hate dînê. Navê wê danî Bengî Heval. Bona vê yekê vê nivîsarê pêşkeşî biranîna DOĞAN ÖZ dîkîm.

M. DERSİMÎ

Xwendevanên hêja,
Em di vê hejmarê da dest bi danasina hın beşên bijarte yên edebiyata cihanê dîkin. Mebesta me ewe ku, xwendevan, li ser hın nivîskar û efrandinên edebiyata cihanê, bi kurdî bixwînin û wan binasin.

Leo Tolstoy sala 1828' an li gundê Jasnaja Poljana li başûrê Tula hate dînê. Di sala 1910'an da li Astopovo mir.

Ew ji malbateke aristokrat bû. Di universita bajarê Kazan da xwend. Beşdarê şerê Qırımê bû. Piştî şerê Qırımê dest bi nivîsarên literatûrî kir. Gelek salên xwe bi xebatên pedagojîk û reformatîk di nav gundiyan da derbas kir. Efrandinên wî "Şer û Aştî" û "Anna Karenina" pîr bi nav û dengin.



TOLSTOY

Dema hın Leo Tolstoy piçûk bû, rojekê birayê wî yê mezin Nikolay bi şayi û kêfxweşike mezin jê ra got weki ew rasti defineke ve şarti û mezin hatiye. Eger ev sîra han ji aliyê herkesî bihata zânîn, gor bawerîya wî, xweşî û rehetîke mezin wê peyda bibûya, dema ke zêrîn wê destpêbikira ji bo hemû mirovan. Hemû nexweşî, kul û derd, belengazî û neyartîya navbera mirovan wê yekten ji navê rabûya. Herkesî wê xwe bi hevaltî û hevqirtîneke esrarenjîz va grêda. Wî, ev hevqirtîna han bi "Moravskiye Bratya" (Bratîya Mûriyan-mûristangan) nav dîkir. Nikolay nêzîkî rakîrîna perda ser vê sîra mezin nedibû. Gelo hemû mirov wê çawa ji belengazîyê, ji tariyê derbasî hebûnê û ronahîyê bibûna?. Wî carna behs dîkir weki ev sîra han li ser gopalekî hêşîn nivîsandîye û di şaxeke çiyayekî da, li darîstanên Zazaka, li Yasnaja Poljana hatiye çalkîrîn (veşartî). Yasnaja Poljana mîlkê malbata Tolstoy bû.

Nivîskarê rûsî yê mezin Leo Tolstoy, dema bi vê yekê hîsîya, he yecaneke mezin kete nav dilê wî û ji wê rojê şûnda "Moravskiya bratya" qet ji bira wî nedîçû. Gopale hêşîn û ew sîra li ser nivîsandî ji, usa veşartî ma di binê erdê da. Li ser daxwaza wî, iro ew bi xwe ji li wir di nav darîstanên Zazakan da hatiye binaxkîrîn. Gora wî bê kêlîk û tîrbe li ser girekî hêşîn bilînd dibe.

Piştî ku Tolstoy'ê xort xwendîna xwe ya universîtê qedand, di sa vegerîya Jasnaja Poljana, jiyana xwe di nav gundiyan da domand. Pa şê wek serleşker tevî şerê Qırımê bû. Di xortaniya xwe da dest bi nivîsarên edebî kir. Efrandinên wî yê pêşîn: "Zarokati" (1852), "Xortani" (1854) û "Kozakan" (1863). Roman û hikayetên wî nivîskarê bi nav û deng "Şer û Aştî" (1865-1869) û "Anna Karenina" (1874-1877), iro li çaralî cihana hevdem têne xwendî û nasîrîn.

Tiştê wi yê ku pır kêm tê zanin, xebata wi ya dı nav gundiyan da û lêkolinen pedagojikin. Xebata Tolstoy jı bo fêrkırın û perwerdekırına gundiyan, ciheki gıring dıgırt dı jiyana wi da.

Dı sala 1859'an da, Leo Tolstoy lı Yasnaja Poljana, jı bo zaro-kên gundiyan dibıstanek vekır. Çend salan şında xaniyeki du qat a-vakır wek dibıstan û lı ser deriyê wê nıvisand: " *HÛN HEMÛ KÊSÊN KU TÊNE VIR, DIKARIN SERBEST WERIN Û HERIN*".

Ev gotına han, wek hevrikê (zıtê) gotına Dante Alighier (1261-1321 nıviskarî İtali)-ku dı "Divina Komedia" da lı ser cehennemê gotıbû, hatıbû nıvisandın. Dante Alighier waha dınvıvisine: "*HÛN HE MÛ KÊSÊN KU TÊNE VIR, GUMAN Û HÊVIYA XWE JI HER TIŞTÎ BIBIRIN*",

Tolstoy dı sala 1861'an da çû lı Ewrûpayê geriya. Dı rê gera xwe da ew jı nêzik va bı sistema dibıstanên welatên Rojavayê va eleqeder bû. Tiştên ku wi lıwır ditıbû, intıbake nebaş lı ser wi hiştı - bûn. Dibıstanên Rojavayê yek cehennem bûn gor ditına wi. Paşê ku jı wır vegeriya welêt, dı navbera Sebat 1862'an û Adar 1863'an da, 12 bend (mıqale) lı ser pırsên mezinkırın û perwerdekırına zarokan nıvisand.

Tolstoy, dı nav gundiyan belengaz da xwe şad û dılxweş dihe sıband. Azadiya gundiyan daxwazeke kûr lı ba wi. Azadi, ev gotın gotıneke taybeti bû dı nav ronakbiriya (intellegesya) rûsi da.

Lı dibıstana Tolstoy, kingê mırov bıxwazta dıkarıbu gotıaa ma - moste bıbıriya, jê tiştekek bıpırsiya û lı gotınên wi rexne bıgırt. Carna jı devjeni û munaqeşên pır hışk derdiketin. Lı vê dibıstanê tu plan û bernameke hınkırınêye taybeti tunebû. Mırov tiştan fêrdı bû, jı ber ku fêrbûn hım xweş bû hım jı pêwıst bû.

Tolstoyê kal, dı salên xwe yên dawın da, her tım bı dibıstana xwe û gundiyan va mıjûl bû. Ne tenê zarok, mezın jı dıhatına vê dı bıstanê. Diwarên dersxanê seranser bı pırtûkan hatıbûn rêzkırın. Hemû kes, carna Tolstoy jı dı nav wan da, lı dora maseke gılover dıcvıyan, xwendı, nexwendı, zana û nezan herkesi ramana xwe dıgot dıpırsı, bersiv dıda. Armanç lêgerin û ditına rastiye bû.

Wek nıviskar û hunermend, qelemeke xurte Tolstoy. Şudmendiya wi, jı tasvirkırın û şırovekırına wi ya xurt tê. Jiyana gundiyan û rıs û pêwendiyên dewletê û gundiyan, temayên serekene dı qelemêşiya Tolstoy da. Wi, tım jı bo gundiyan, lı dıji zortestiya dewletê û û nezaniya dı nav gundiyan da, qelema xwe bı hostati hejand. Belki jı dıxwast wi gopalê heşın û wê sıra mezın, ku dı zarotiya xwe da bıhistıbû, bı qelema xwe, bı eserên xwe yên edebı va derxe meydanê.

Raste, Tolstoy jı dewleta zorê, jı zordestiyê nefret dıkir, lê lı hember zordestiyê dıjderketıneke pasiv dıxwast. Jı bo çarelêkırına pırs û dıjwariyên civaki, bı berçavkên exlaqê oli, lı jıyanê dın-hêri, bersiv û nesihet dıda. Dı warê oli (dini) da olperesteki hışk ne bû, lê mırov dıkarê bıbêje weki ew jı aliki va parêzvanê exlakê oli, jı aliyê dın va jı rasyonalist bû.

Sala 1908'an Lenin lı ser Leo Tolstoy gotarek nıvisand. Lenin dı vê nıvisara xwe da, Leo Tolstoy wek neynika şoreşa û rıs bı bir-tine û waha dibêje Lenin:

" *Lı aliyeki, hunermendeki xurt û zirek, ku jiyana civata û rıs bı wêneyên pır jı hev cuda, bı hostati lı ber çavan radıxe û bı e-fırandinên xwe yên edebı va, lı dereca yekemin edebiyata cihanê dewlemend dıke. Lı aliyê dın, xwediyê mılk û erd, ku nişana şehi-dan bı navê İsa (pêxember) bı pêsiira xwe va kırıye. Lı aliyeki, hê-zeke pır mezın û bê hempa, lı dıji derew û sextekariyên civaki (sos-yal). Lı aliyê dın, tolstoyvanek, ronakbireki û rıs, berketiye diro-kê, jı bo rojên buhuri hêstırkan dıbarine, gazın û loma dıke û bı*

awaki vekiri lı sîngê xwe dıxe û dıke qêrin:

- Ez belengazım, bêçareme, lê ez lı dû wi tıştıme ku, dı wâfê
exlâqı da bı xwe va werım, lı ser piyan rawestım. Ez, idi jı vır
şûnda goşt naxum, xarına mın tenê bırınce.

Lı aliyeki, rexnevaneki bê hempa tûşı berbı teqandına sermaye-
dariyê (kapitalizm), şırovekarê zordestiya hukumatê, komediya ser-
wêreñ dewletê, kışandına kırasê lı ser rûyê rastiye û dawiya de-
rewan. Nişandarê sedemên mezınbûna gelşa navbera xezani û dewlemen
diyê, zılm û zordestiya ku zehmetkêş dıbinın. Lı aliyê dın jı, bê-
hişıyeke mezın, ku lı hember zordesti û êrişên hışk, dijderketıne-
ke nerm û pasiv pêşniyar dıke".

Çêtır jı mırov nıkare taybetiyên lı ba Tolstoy, bı kurtebirı bı-
de naskırın. Tolstoy, jı Yasnaja Poljana çû Astopovo û dı xaniyê
istasyonê da - nıha istasyona Leo Tolstoy - çavên xwe lı jıyanê
girt. Gotına wi ya dawiyê ev bû:

" Lêbigere, tım lêbigere û rastiye bıbine"■

.....

SERASTKIRINEK

Dı hejmara 48'an da, navê niviskarê mıqala "Mestûre" Tosinê
Reşit, bı xeletike tekniki va nehatıbû nivisandın. Bo vê yekê em
dıxwazın niviskar me bıborine.

Redaksiyona ROJA NŪ

DİSA ROJ ÇŪ AVA

Wexta roj dıçe ava lı pışt çıyan,
xemê dilê mın zêde dıbin.
Tari dıbe asıman,
Tên biramın
Bê waran pêşmergên serê çıyan.
Evên ku sterk balif,
Ewrên tari lıxefa wan.
Roj dıçe ava
Hêsır jı çavên mın tên xwarê.
Tari dıbe asıman,
Tên biramın,
Zarokên dayika mın "Kulilkên Kurdıstan"
Evên ku jı sermana dıricıfın.
Dest dı paşılên wan,
Rûniştına lı bin diwaran.
Roj dıçe ava
axın jı dilêmin dertê.

Tari dıbe asıman.
Tên biramın
Hevalên hêja yên ku lı girtigehan,
Ewên ku bo azadiya gel lı zindanan
Lı işkencexanan
Dıbin zılma kelbê faşıstan.
Disa roj çû ava lı welatêmin.
Gıriyam, dı şevkêda bı caran
Lê mın baweriya xwe wunda nekır
Çavê mın lı berbangê.
Hılatına "Roja sor"
Ew roj wê bê tırsbe, wek xewna şevan
Emê bışikının deriyên hesın,
Deriyên zindanan,
Azad bin lı welatê xwe.
Dı bin roja sor da,
Wê mezın bin "Kulilkên Kurdıstan"

Keça Kurd
Fatê

Heftê Çanda Kurdistanê

Komela Karkerên Kurdistan lî bajarê Frankfurtê (Lî Elmanya Federal) dî navbera rojên 24-30/9-1984'an da Heftê Çanda Kurdistanê amade dîke. Jî aliyê komelê da, dî nav vi hefte yi da gelek xebatên çandî û hunerî wê jî gel ra bîn pêşkêşkirin.

Dî destpêka hefte da N. Ararat wê lî ser literatura kurdan ya devki û nivîskî bîpeyive, Hasan Dewran jî pirtûka bî navê "EUPHRAT" wê helbestên xwe bixwîne, disa helbestvan Gundî helbestan pêşkêş dîke. Huseyin Erdem jî dî wê beşê da kerikî destana Siyabend û Xecê bixwîne.

Dî beşa muzikî da, Şivan Perwer, Nizamettin Ariç, Kemal, Delal û dengbêjên mayîn wê klamên kurdi bistrên. Disa dî nav vi hefteyi da du (2) filmên lî ser kurdan wê bîn nişandin, "Em Kurdin" û "Yan Azadi, Yan Mîrîn".

• • •

KOMEF

Hat Sazkirin

Lî Danimarkê, bî navê "Komela Folklorê Kurdistan" (KOMEF), Komeleke nû hat sazkirin. Jî bo pêştî bîrîn, danasîn û rêvabîrîna xebatên çandî û folklorê kurdi lî Danimarkê, ev komele wê rêz bî rêz kar bike. Berî vebûna komelê bî zîmanê kurdi- tirkî û danimarkî belavokek hat weşandin. Dî belavokêda armancên komelê yek bî yek hatîne nişankirin û komel bangî hemû welatparêzên kurd dîke, wekî alîkariya wê bikin.

Lî Stockholmê

Beşa Kurdi

Vebû

Lî Stockholmê, dî Xwendegêha bî lînd ya Mamostetiyê da beşa kurdi vebû. Bî vi awayî, cara yekemîn lî welateki Ewrûpayê, dî xwendegêha bî lînd ya mamosteyên kurdi wê bîn amadekirin. Zaningêha Stockholmê, jî bo beşa kurdi isal 9 kes girt. Pîştî 2 salên xwendinê, mamosteyên kurdi wê jî bo perwerdekirina zarokên kurd amade bîbîn.

Çawa tê zanîn, dewleta Swêd jî bo perwerdekirina zarokên biyaniyan mamosteyên zîmanê dê dîgihîne. Jî bo kurdi jî dî vi mafê han da xwedipar bîn, Federasyona Komelên Kurdistan sala çûyî lî merciyên resmî daxwaza vekirina beşa kurdi kîr. Ev daxwaza kurdan isal hate cih. Wek finladi, yûnani, tirk, yugoslav û yê mayîn, kurd jî gihîştin vi mafê han.

Bêşik vebûna wê xwendegêhê ne tenê aliyê perwerdegari, zîman û çandî da kurdi da bûyereke girîng û gavê ke pêşdaye, lê herusa dî aliyê siyasetî da jî, bîlîndbûna rûmeta tevgera gelê kurd dîde xwiyan. Hîngî şerê gelê me jî bo azadiyê fireh dibe, ew dî warê navnetewî da xwe dîde naskirin, piştgiri û dostaniya gelên din distîne. Jî vîr şûnda jî wê bîstîne. Lê diyare ku ev jî, jî xwe berêva pêknayê. Dî vi wari da wezîfe û pêwîstiyên mezînan dîkeve ser milê komele û rêxistinê. Dema ku bî tevayî, bî hevgirtîneke xurt daxwaza tîştan bête kirin, şansê serfiraziyê û bîdesxîstîna mafan pirtîr dibe. Vebûna xwendegêha bîlînd jî bo mamosteyên kurd lî Swêd, wê rastiyê nişandîde.

Hêvî û daxwaza me ewe ku, dersdar û xwendekarên kurd, jî wê fersendê û gengaziyên (imkanên) heyî, bî şêwa kî herî qenc istifade bikin û bî kêrî gelê me bîn.

Zembilfiroş

Berevkar: XELİLÊ ÇAÇAN MURADOV

Go, perê Dereketê,
Şeherê şin û mînetê,
Devê çemê Gewgewe
Dîma maleke bënave.
Maleke kesiv, belengaz,
Jî hêsiyê gaze-gaz.
Salji dîhate salê,
Derd dernedîket jî malê.
Xweyê malê lawkê cîndî,
Gerdana wi nûra fîndî,
Bejn û bala wiye tital,
Rasti noli dara çînar,
Lê tu were hêsiyîya kul.
Wî pêtibûn ceger û dil.
Ewi emrê zelûli boş,
Xort kırîbû zembilfiroş,
Avitîbû nav qir û dojê,
Kırîbû hewcê nanê rojê.
Sîbê zû, ku teyr dîxûne,
Ew zembila kaw dîhûne,
Ew xewa xwe dîherîmine,
Belki nanê zara tine.
Zembil sela davêje mîl,
Dî nav şeher dîde fitîl,
Kîncê wi jî zitol-zitol
Lî ber bayê dibîne hol
Ew dîgere soqaq-soqaq
Hîldîkîşe qesrê pîrقات.
Ro jî heye, roja şekê,
qazanc nake qe polekê,
Ew vedîgere por û poşman,
Destevala, bê tîşt û nan.
Vîr dîkeve nav mîtala,
Çawa here nava Zara,
Çawa here destevala?
Bîde zara çî berdîliyê,
Serê xweke erd û xweliyê?
Tuyê bêpere nan ku bîni,
Tuyê herî nan kê bîstîni?
Aylîx tune bîki deyna,
Beya tune bîkî ina,
Dîlêş tune serda herî,
Kê tera nan bîke kerî?
Îsaf nema bîki sebir,
De tu were û bîdebir.
Tu bîrevî berbî ki alî,
Şîpûke tek va çar alî,
Ne hebûne û ne jî mal,
De tu xwera hergav bînal...



Ew naxwaze qe here mal,
Ku bigere boş û betal.
Wexta şeher bûye terî,
xanê nakîn evd û merî,
Şevederî çî bigerî,
Berbî mala kê tu herî,
Tuyê herî ku serî daynî,
Ne heye cî, ne jî xanî,
Çevî rêne te jîn û zar,
Lî tekeve tîr, zîlfeqar...
Carna jî ew naçe malê,
Jîn dîkeve nav mîtalê,
Ka çawa bû Zembilfiroş,
Hate sêrî qezyake boş.
Gelo girtîn, gelo kutan,
Yanê yekî xwe lê kır qan?...
Zembilfiroş, ku egle bû.
Elê zane nan tunebû,
Gava ku zar tev radîzên,
Zembilfiroş wî çaxî tê.
Bîrçîbûn lî nav çeva,
Zar ranedîzan roj û şeva.

XXX

Go, rojeke gele xweş,
Şemal dîda teva geş,
Vedîbûn gul, bînefiş,
Hewza dîkîr xuşe-xuş,
Lî nav şeherê gîran,
Nav wê kavla hêş, wêran,
Zembilfiroş fitîl dîda,
Zembîl, sele stuyê wîda.
Dîkîr gazi:- Zembîl, zembîl,
Selîkê kaw, zembîlê çîl.
Kê dîkîre ne poşmane,
Qîmetê wan zef erzane...
Xatûnekê serê xwe derxîst,
Jî qatê jor wek geş buhust,
Ewê zû da dûrebinê,
Vîr dit ecêbeke dînê.
Dît xortekî, bîlînd, talyan,
Nûr dîbarî sûret û can.
Kubra wiyê ezîz şîrîn.
Dîlê evîn dîkîr bîrîn.
Ber çevê wê reşevêhat,
Tîra hubê wê dîl hîngavt.
Xatûnê zû kîre qarîn,
Ber sekînin çîlyek carî.

-Qe mın nebye ha eczayi,
Hûn zû binın ewi lawi,
Derdı wi ez bûme bawı...
Carya banzdan ew xort anin,
Zembil, sele mıl deranın,
Doşeka mir jêra danin.
Xatûn û xort tek-tenê man,
Deri, derge lı ser dadan.
Zembilfiroş kete belê,
Dit xatûnê kır çengelê.
Xwidana sar serra avit,
Wi tırê ling lı wi bûn qit.
-Ev çı yeke, xatûna kaw:
Ev çı gliye, ev çı hesab,
Boy çı te ez anım vıra,
Eva tamam gelo çıra?..
Xatûnê go:- Xortê dindar,
Mın tu ani, ku bibi yar...
- Tu xatûni, jına miri,
Çı dıxwezi mın feqiri?
Wê xatûna gerdenmori
Xortra wa got bı kubari:
- Tu rûnê ser doşeka mir,
Xwera bıqşın qelna wezir.
Wa jêra go Zembilfiroş:
- Ev şuxuleke haşe û boş.
Xudê enya mın nıvısı
Tek hêsiri, emrê nuqsi.
Ezê kura bêm ser cıyê mir

Emrê zelûl, ku bıkim bir?
Mir, ku heye,ew jı qeda,
Tu çı lı mın bûyi bela?...
- Zembilfiroş, lawkê delal
Tu guh bıde gliyê kemal.
Mir, ku heye merê reşe,
Dıl-dinê mın lê vedireşe.
Ez beni bûm, Benike tam,
Destê mirê zulmkarda mama..
Noli mûmê destda helyam.
Dewsä zêr, bûm paxirê xam.
Hılkışı tu ber ezmana,
Xılaz nabi mın çogana.
Dibê xorto, teple nebe,
Tera dibêm were rayê,
Jı serhişkiyê tu kar nayê.
Ezê tekım çekê cındiyê,
Te derxım jı teli-tengiya.
Xatûnê xwera kır kare,
Sûreta gul jê dabare,
Lı memıka sêv, hınare,
Gerden tu dibê bahare,
Şa dıbe eşqa dılane.
Go, xatûnê usa germe,
Jı ber germê erd dıkele.
Tu zû veke pencerê,

Hınki bina me derê,
Zembilfiroş çû ber deri,
Dit reva wi nayê seri.
Ew paşda çû ber pencerê
Û xwe avit birca kelê.
Qerpalê wi mina çadır
Nav hewêda zû-zû ba gırt,
Ew berjêr bû hêdi-hêdi,
Wi xwin nebû heta pêçi.
Bı wê tırsê û xıyalê
Zembilfiroş revı malê.
Zembilfiroş hatye malê
Elê pêra genc û qale,
Dıbê:- Sıbeda çûyi, eva êvare,
Kanê rısqê herdu tıfale?
Dıbê:- Ez çûme kûça mire,
Mın wêderê selkê xwe kır jı bire
Lema nanye rısqê zar- tıfale.

XXX

Beni xatûnê hevraz dınhêri, dıkewgiri,
Kêlek hatê, rûnişt û giri,
Rokır- pıva, kur-dûr fıkrı...
Beniyê gelek da zora pera,
gelek ruşet û bertıl da,
Lê kır û nekır
Tu belgekwê jı Elê venekır.
Beniyê nıhêri, weki wa nabe,
Tu çar û meni jêra çênabe,
Ani hat Elê kire cari
Belki nêta xwe ew bine sêri.
Neqebçi ani, zor pere dayê,
Ew kire çamê û ani rayê.
Hey Beniyê, hey Beniyê şerbet bı noş
Neqeb çê bû heta mala Zembilfiroş.
Beniyê ani Elê wê şevê kır nobedare,

Belki here mırazê xwe ew şabe.
Zembilfiroş vecênıqi nivê şevê,
Dit lingeki sari xırxal
Lı lingê wi bûye gopal,
Dit zendeke mori- mırcan,
Hemêz kırye wi stu û can...
Go, eva çıye, ev çı qewi?
Dit Beniyê lı nav cıyê wi,
Jı nava ciya ew zû revı...
- Zembilfiroş, lawkê dindar,
Mınra bıbe tu mêr û yar...
- Tu xatûna mine delal,
Zembilfiroş te nabe helal.
Heta hebe Ela mın,
Ez tu cara jê naqetım,
Mir û axa ez natırsım,
Lê namûsa xwe nafroşım.
Ev mıcan idi lı mın herame,
Ezê herım ciki usana,
Ku lê tunebe mir û sultane.

Zarokên geliyê laçe



ALİQAMER

Rojeke havinê germ bû. Esmen wek sêleke sor dîsinciri, te dîgot ka ji tirêjên roja zer agir dîbare ser rûyê erdê.

Wê salê şer hebû lî Dersimê. Ew çend roj bûn dor lî geliyê Laçê hatibû girtin. Ewqas esker lî wir komkîrîbûn ku heta wê rojê kesi ne ditibû, ne ji bîhistibû. Gurmîniya topan, dengê tîvingan nedîsekîni. Ewrên toz dûmanê, lî ser hev kom-komî bibûn. Şer geh lî vir, geh lî wir geş dibû, dengê merivan û silahan tevlihev dibû. Şervanên kurd û eskerên tîrkan, ew çend roj bûn ketîbûne ber pêşîra hev û şerîki bêeman dîajotîn.

Lî ser tepeki, dî ber zînareki da, serokleşkerêki tîrk enîşka xwe dabû zînar û ji wir qumanda hêza xwe dîkîr. Westiyayî bû, qîdûm dî çokên wi da nemabû. Çokên westiyayî, dî bîn gewdê wi da nî karîbûn rawestiyana.

Demekê panzdeh-bîst gavan wêda, du zarokên kurd ber çavên wi ketîn. Bî ditîna wan ra vecînîqî serokleşkerê tîrk. Wî ew westan û giraniya xewê ji ser xwe avêt. Bî tehreki ecêbmayî lî zarokan temaşe kîr.

Zarokên dil yek şîv dî destê wan da, hertîm çavên wan lî meydana şer bû. Rûyê xwe ji wir nedîguhastîn. Şîvên dî destê xwe da wek yek tîving girtîbûn, mîna ku bî wan gulle berdidane dîjmin pêşda dîçûn, paşda vedîkîşîyan. Qet dî bîra wan da nebû ku, dî destê dîjmin da, lî ba hêzeke eskeriyê dil û hêşîr bûn. Hîş û ramana wan tîm lî ser şerê dî geli da bû. Carna rûyê wan dîkeniya û carna ji mîrûzê xwe dîkîrîn. Wan dî ber xwe da hîn tîşt dîgotîn, lî qumandarê tîrk tînedîgîhişt ka ew çî dibêjîn. Hîngî hatîbû Dersimê ew cara pêşîn bû. "Mîn kurdi bîzanîbûya wê baş bûya" got dî dilê xwe da.

Çavên xwe yê bî xwîn çend caran girt û vekîr, bî tîliyên xwe cênîkên xwe mîzda û nişkêva zîvîri ser Eliyê Dersimî ku, milîsî dî kîr; jê ra got were vir. Eli wek hercar bî tîrs nêzîki serokleşker bû.

- Keremke beg

Serokleşker zarok, bî tiliya xwe nişani Eli da

- Hela binhêre, lî wir binhêre tu wan dibîni? Jî Eli 'ra got. E-
lî lî wi alî mēzekîr, dema çavên wi bî wan zarokan ket, kizîni bî
dilê wi ket, demekê hiş jî serê wi çû. Nîkarîbû tîştêki bîfîkîre
wê demê. Ev sergêjîya wi zêde dom nekîr, jî xwe nîkarîbû bîke jî.

- Mîn dît, got bî dengekî lerîzî û sar.

Serokleşker bî hêrs çend gavan nezîkî wi bû û got:

- Lê kîrînên wan? Tu dibîni ew çî dîkîn?

Devê Eli, ku bî sîmbêlên qalînd ku ci-ciyan têlê sîpî têda ha-
tibû girtîni, bî zorê vebû û bî dengekî tîrsonek û lerîzî:

- Erî begefendî ez dibînim, bersiv da.

Serokleşker:

- Başê, tu niha gotîna mîni jî wan ra bêje. Em dîxwazîni wan bî
xwe ra bîbîni û lî wan baş binhêrin. Em dîxwazîni wan jî van deran
jî serê van çîyan xelas bîkîni. Yê bîxwîni bîbîni meriv. Wextê me-
zîni bûni wê dewlemend jî bîbîni, bîbîni xwediyê mal û mîlk. Ma xwe
ew jî pê dîzanîni, lî ser van çîyan jîyan tuneye. Dî gelî da jî şe
rek mezîni heyê. Gelî bî cendegan va tîjîye. Pîraniya wan "hovan"
lî wir mîrîni, kêmi jî wan sax man. Şansê wan jî zêde nemaye. Ez dî
pîrsîm: gelo ewê lî ba me bîmîni, an dîxwazîni herîne wir?

- Belê ser çavan beg. Eli bersiv da. Disa lî zarokan vejeriya,
gotîni qumandarê tîrk yeko yeko jî wan ra got. Çavên zarokan dî-
çûrîsîni, dema guh dîdane Eli. Gava Eli gotîna xwe xelaskîr, lawîkê
ku hînekî mezîntîr bû:

- Em naxwazîni lî vir bîmîni. Ma çî dîbe, tu jê ra bîbêjî bîla
me berde, em tu tîştêki wi naxwazîni. Tenê em dîxwazîni herîne jêre
Zarokan çavên xwe yêni xemgîni lî aliyê gelî gerandîni hînekî. - jî
xwe çiyê me ma lî vê dînyayê. Her tîştê me lî wîre. Geliyê Laçê
her tîştê me jî me stand. Em jî dîxwazîni herîne wir, mîna dê û ba-
vê xwe lî wir bîmîni. Bîla cesetê me lî ba cesetê wan be.

Eli, pêşiyê xwast wan razî bîke. Lê bî gotîna wi nekîrîni zarokan.
Nûh dîgotîni, pêxember nedîgotîni. Eli jî bêçare gotîni wan
gîhande qumandar. Qumandar, bî dengekî bîlînd kenîya, lî ser wan
gotîni. Lê ew ken keneke bê mane, dengekî sar bû. Paşê bineke kûr
gîrt, gepa xwe werîmand û cîgerên xwe valakîr. Disa dengekî bê ma-
ne derxîstîbû dema ku ev tîşt jî kîr.

- Têjîkên maran bê jehr nabîni, dîbêjîni. Çîqas jî gotîneke ras-
te. Başê, madem ku dîxwazîni bîla herîne gelî. Xeta ya meye ku, car
na dilê me bî wan dîşewîte. Hûn nabîni meriv, hûn kurd nayêne rê.
Lema dîvê urta we bê qelandîni. Waki dîni tu rê, tu çare tuneye. Kî
çî dîbêje bîla bêje, ev fîkra mîne. Jî wan ra bêje bîla herîni.

Eli nîzanîbû çî bîbêje. Wî dîxwast disa bî wan ra qîse bîke,
belkî wan îkna bîke, lê dîzanîbû gotîni bê faydeye. Gotîni quman-
dar gîhande wan.

Pêşiyê bawer nekîr. Ma qumandarê tîrk evqas baş dîbe? Gelo bî
rastî ev merîvekî evqas dîlgerme? Heta wê gavê qet usa nefîkîrîbû

- Ma rast dîbêjî tu apê Eli? zarokan pîrskîr.

- Raste Eli got. Hûn hema niha dîkarîni herîni, dîxwazîni qet ne-
sekîni, dî ser wan da qêjîya Eli.

Herdu zarok wek tîra ku jî kevanê bîpeke, berbî gelî revîyan,
berbî geliyê mîrîni. Lê şabûna wan zêde neajot. Bî emrê qumandar
û bî teqîna gullan ra her du zarokên Dersîmê, dî nav xwîni da lî
erdê dîrêj bûni û man.

Çavên Eli bî wê xwîna ku erd avdîda û jî xwe ra rê vedîkîr ket,
gotîna serokleşkerê tîrk nebîhîst.

- Heq kîrîni, de bîla herîni! got qumandar.

ÇEND STRAN

Berevkar : NAVDAR

ZÊR ZEYNEBÊ

Zêr Zeynebê l' Zeynebê
Zêrê lı Zeyneba Biruki
Tu b' xızıma şırıkı
Mori l' qırıkê helhemê

Par qız bû isal bûki
Zêrê l' Zeynebê Zeynebê
Par qız bû isal bûki
Mori l' qırıkê melhemê

Zêr Zeynebê l' Zeynebê
Zêrê lı Zeyneba Malbatê
Tu b' xızıma du qati
Mori l' qırıkê melhemê

Biruki: Navê eşirek)
Malbatê: Navê eşirek)

YAR WELLEH KEÇİKE

Yar welleh keçıke,
Billeh keçıke.
Yar dıkım ramısım,
Nızanım çı dıke.

Yar pozi xızıme,
Xızım şırıke.
Ez dıkım ramısım,
Nızam çı dıke.

Yar guhi guhare,
Guhar gupıke.
Ez dıkım ramısım,
Nızam çı dıke.

Yar mılı bazıne,
Bazın şırınge.
Ez dıkım ramısım,
Nızam çı dıke.

Yar welleh keçıke,
Billeh keçıke.
Yar dıkım ramısım,
Nızam çı dıke.



BİNGOLE TU AVA Bİ

Oy yeman, yeman yeman,
Yar yeman.
Oy yeman, yeman, yeman,
Can gula'm can.

Bingolê tu ava bi,
Yar yeman.
Tıji bûk û zava bi,
Can gula'm can.

Ez heliyam, qet tışt neman,
Yar yeman.
Ez heliyam, qet tışt neman,
Can gula'm can.

Ez bûme avên çeman,
Yar yeman.
Ez bûme avê çeman,
Can gula'm can

Bingolê tu ava bi,
Yar yeman.
Tıji bûk û zava bi,
Can gula'm can.

Oy yeman, yeman, yeman,
Yar yeman.
Oy yeman, yeman, yeman,
Can gula'm can.

MİRZEME - MİRZEME

Mirzeme mirzeme, welle mirzeme
Mirzeme mirzeme, delal mirzeme
Genimê lı dewsa cêh me
Welle mirzeme .

Mirzeme mirzeme, delal mirzeme
Guharê guhê te me, keçê mirzeme
Mirzeme mirzeme, delal mirzeme
Xızêma pozê te me, welle mirzeme
Gustıla tılya te me, bille mirzeme
Bazınê zenda te me, welle mirzeme
Mirzeme mirzeme, delal mirzeme

Mirzeme mirzeme, keçê mirzeme,
Aşiqê bejna te me, welle mirzeme



ZENBILFIROŞ - Siyabend